

## Her tişt bê te ye!

Di vê êvara payîzê de, li dengê Mîryem Îbrahumpur guhdarî dikim. Dengê wê, hem xemgîniya payîzê, hem jî kêfxweşiya ji bo hatina biharê tîne. Bi dengê xwe yê zelal û azad, bi hunera koma xwe ya bêhempa, xwe di bîr, çav û dilê te de bi cih dike... *Dîlan Aydin / RÛPEL - 2*



## Lingên pînik ên mirîşkan

Dengbêj û hunermendê muzîka rapê Şakiro, di kilama 'emro' de wiha dibêje: "Ez çûme Helebê dîkê serê sibê li min xul-xuland." Li vir dîk qasidê berbangê ye. Ger me bala xwe dabê, serçopîyên govenda Amedê, pîkolan dîkan dikin û hindik dimîne ku bifirin... *Seyidxan Anter / R.5*



## Nexşeya navên gundan

Li Tirkiyeyê navên bi deh hezaran gundan ên bi erebî, bûlgarî, ermenî, gurcî, kurdî, lazî, suryanî, yewnanî hatine guhertin û navên tirkî li wan hatine kirin. Mordem Zel, navê gundên rast ên bakurê Kurdistanê berhev kirine û li nexşeyê nexşandine... *RÛPEL - 11*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

5-11 Cotmeh 2020
Hejmar: 42
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Dema hevgirtinê ye

*LI DIJÎ HEBÛN Û DESKEFTIYÊN* kurdan pêla êrîşan zêde bû. Hefteya borî bi dehan siyasetmedarên kurd hatin binçavkirin û girtin; qeyûm tayînî şaredariya Qersê kirin; welatiyê bi navê Servet Tûrgût ku li Wanê ji helîkopterê hatibû avêtin jiyana xwe ji dest da; di doza malbata Şenyaşar de edalet pêk nehat... Li dijî erîşan piştevanî û hevgirtin ji her demê zêdetir dibe. Li aliyê din, partî û rêxistinan banga têkoşîna hevpar kir... *RÛPEL - 3*



## Êdî peyv têra jinê nake!

Hediye Yaşar 2 sal berê dest bi wênesaziyê kiriye û piştre jî bi navê 'Metal Kolektîv' bi 15 jinan re dest bi çêkirina peykeran kiriye. Yaşar cara ewil bi navê 'Alegoriya demê' pêşangeha wêneyên xwe vedike. Herî dawî jî bi navê 'Karên Muşterek' a ku atolyeya A4'ê amade kiriye projeya xwe pênase kir. Yaşar diyar kir ku mijara xebatên wê tenê jin in û got ku di jiyanê de êdî peyv têra jinê nake... *RÛPEL - 2*

## Xopawitiş û destbendkerdişî

Çiqas şono dinya û Tirkîye de zilm û zordarîya ke serê cinîyan de yeno rayraberdene hîna zêde beno. Ganî cinîyî xopawitişê meşru bigêrê vernîya xo û bikerê rojeva xo ya yewine. Tena aşma êlule de 36 cinîyî ameyî qetilkerdene. Cinîyê ke wazenê hemverê qetlîyam û destbendkerdişan de biveĵîyî raşteyan, yenê destbendkerdene û tepiştene. Qet şik çino ke ganî heme çî ra... *Semra Turan / RÛPEL - 9*

## Firînên mirinê



Tirkiyeyê pergala xwe li ser berevajîkirin û çewtkirina rastiyan ava kiriye. Li şerê xwe yê qirêj xwedî dernakeve; hem aşkera ye, him piştperde ye. Walîtiya Wanê li ser bertekan... *Munewer Azîzoglu Bazan / R.2*

## Bi şerxwaziyê heta ku derê?



Dewleta tirk hebûna xwe, bi şer û êrîşkariyê didomîne. Li hundir şer, li derve şer, bi gel û cêwaziyan re şer, bi cîranên xwe re şer, bi her kesî re şer... Li Rojhilata Navîn... *Mem Avba / R.6*

## Şerê Qerebaxê



Pirsgirêka herêma Qerebaxê ji destpêka sadsala 20'an û vir ve di rojevê de ye. Ev pirsgirêka heyî, ji serdama Sovyetê heya niha nehatiye çareserkirin. Herêma ku 4 hezar û 400 kîlometre... *Felemez Ulug / R.8*

## Îstîfa



Îstîfa çekuyê ke bi erebî ya. Maneya xo, jo xo bi xo dest kar ra verado. Di serdemê modernî de, bi taybetî welatanê modernan de îstîfa zehf yena xebetnayîşî, welatê tepiya mendê... *Cemîl Oguz /R.9*

# Li Kurdistana Sor şerê ermen û azeriyan

Di 27'ê îlonê de li herêma Qerebaxê ku di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de ye, şer dest pê kir û dewam dike. Cihê niha şer lê diqewime herêma Kurdistana Sor e; lê di nûçe û agahiyan de ne navê kurdan heye û ne jî navê erdnîgariya ku 100 sal berê Kurdistana Sor lê hatibû avakirin. Kurdistana Sor di sala 1923'yan de hatiye avakirin û ji 6 bajarokan pêk tê û navend Laçîn bû. Li gorî serjimêra sala 1926'an nifûsa Kurdistana Sor zêdetirî 51 hezarî ye. Ji sedî 73 kurd, ji sedî 26 azerî û yên din jî ermen in. Ji ber zextan gelek malbat koçber bûne... *Nûçe-analîz / RÛPEL - 8*



## Bi dengbêjiyê têdikoşin

Şefîq Yilmaz (45) û Xelîl Bayindir (41) du stranbêj in. Ew ji gundê Tuxlanê yê navçeya Kanîreşê ya Çewlîgê ne. Yilmaz û Bayindir pirsên rojnameya me bersivandin û gotin ku ew ji bo çanda dengbêjiyê têdikoşin... *Hevpeyvîna Zeynel Bulut / R.4*

## Armanca dorpêçê çi ye?

Ev demek e, hikûmeta başûrê Kurdistanê li ser sînorê Rojava pêşmergeyan bi cih dike û nêzî 40 xalên leşkerî li herêma Fîşxabûr a li hemberî sînorê Rojava ava kirin û cebilxane û çekên giran anîn herêmê. Ev yek ji bo xelkê Rojava dibe cihê fikaran û bi taybetî jî ji ber rayedarên başûrê Kurdistanê der barê vê mijarê de tu agahiyan nadin, fikar zêdetir dibin... *RÛPEL - 6*

## Girîngiya wergerê

Her sal 30'yê îlonê wekî Roja Werger û Wergêran a Cîhanê tê pîrozkirin. Bêguman werger di pêşketina neteweyekê de xwedî cihekî girîng e. Gelek netewe berhemên cîhanê wergerî zimanê xwe dikin û kêm be jî hinek berhem wergerî kurdî hatine kirin. Têkildarî mijarê li Qamişloyê mamosteyê Peymangeha Wergerê Welid Bekir ji rojnameya me re axivî... *R - 11*

# Êdî peyv têra jinê nake!

## Wênexêz Hediye Yaşar a têkildarî karê xwe axivî, diyar kir ku mijara wêne û peykerên wê tenê jin in û got ku êdî peyv têra jinê nake û dixwaze bi wêneyên xwe vê rastiyê nîşan bide

Navenda Nûçeyan

Hediye Yaşar (42) ev 22 sal in ku di sektora tenduristiyê de dişixule lê ji ber ku ev kar ji gelek aliyan ve ruhê wê têr nekiriye dikeve nav lêgerîneke cuda. Ji ber vê yekê du sal berê dest bi wênesaziyê dike û piştre jî bi navê ‘Metal Kollektîv’ bi 15 jinan re dest bi çêkirina peykeran dike. Yaşar ku du sal berê bi navê ‘Alegoriya demê’ pêşangeha wêneyên xwe vekir, beriya hefteyek jî bi navê ‘Karên Muşterek’ a ku atolyeya A4’ê amade kirî projeya xwe pênase kir.



Hediye Yaşar der barê wênexêzî û xebatên xwe yên bi navê ‘Metal Kolektîf’ê axivî û diyar kir ku çîrokên hemû jinan hevpar in.

Yaşar a hem bi wênexêzên xwe de hem jî bi peykerên xwe qala çîrokên jinan dike, da zanîn ku di xebatên wê de jin mijara sereke ne û wiha got: “Di axaftinê de gelek tişt li ser jinan tên gotin. Rastiya ku jin rastî tundiyê hatiye û hê jî tê, êdî min nexwest bi peyvan bînim ser ziman. Ji bo vê yekê jî dema min dest bi xêzkirinê kir, biryara ku ez ê tenê jinê xêz bikim derkete holê. Min xwest tenê mijar jin bin.”

**Ji kuçeyan heta jinên li qesran**


Yaşar di naveroka xebatên xwe de bi giştî balê dikişîne ser jinên li malan, derve, kûçeyan, bajaran heta li qesran û têkildarî naveroka xebatên xwe ev tişt tîne ziman: “Va ye jin li her derê ne û hewce ye êdî ev yek were ferqkirin. Hişmendiya serdest bixwaze nexwaze jî jin li ber çavan û li ser pêyan e! Ji bo vê yekê jî ji jinên kuçeyan heta jinên qesran mijara wênexêziya min e. Ji ber ku xaleke wan a hevpar heye. Yanê bi kurtasî jin di qesrê de be jî di kuçeyê de be jî rastî tundiyê tê û yan jî li hember vê tundiyê ji qesran heta kuçeyan li ber xwe dide. Armanca min jî ew e ku bi xêzên xwe van rastiyan raxim ber çavan.”

**Bîreke hevpar**

Di axaftina xwe de Yaşar diyar kir ku dema wê dest bi wênesazî û peykersaziyê kiriye, gelek hûrgiliyên der barê jinê de ferq kiriye û ev nirxandin kir: “Di destpêka karekî de mirov destpêkê ji aliyê fikrî ve hûr û kûrtir dibe. Di van xebatên xwe de min jî ferq kir ku ez li taybetmendiya nasnameya xwe ango jinê bi awayekî berfirehtir meyze dikim. Yanê çîrokên her jinekê çîrokên min in jî! Min bi vî awayî bîra xwe û ya hemû jinan hevpar dît.”

**Xebatên kolektîf**

Hediye Yaşar ji bo koma xwe ya bi navê ‘Metal Kollektîf’ê jî da zanîn ku ji jinan re xebatên kolektîfî pêwîst in û wiha got: “Nirxên xebatên kollektîfî xwedî ruhekî cuda ye. Xebatên bi vî rengî roj bi roj mirovan pêştir dixin. Qada min a ku ez tenê dişuxulim jî heye lê qada ku em jin tev tê de xebatên xwe yên hunerî dikin hîn zêdetir min bi pêş dixin. Di mijara hunerê de dema kolektîfî hebe di wir de fikren civakî jî hene.”



Der barê peykeran de yên ew û 7 hevalên xwe bi hev re çêdikin jî, Yaşar diyar kir ku di malzemeyên peykeran de potê pêçanê û polyesterê bi kar tînin û got ku di xebatên kolektîfî de jî mijara peykerên wan tenê jin in û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Me di van xebatên xwe de nexwest cih bidin peykerên mêran. Ji ber ku peykerên mêran an wekî komên leşkeran xuya dikin an jî şer û pevçûnê tînin bîra mirovan.”



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Firînên Mirinê

Firînên (an jî balafirên) mirinê (bi spanyolî: vuelos de la muerte) yek ji rêbaza kuştina bêdaraz e. Kuştina bi vî rengî ku ji hêla hêzên leşkerî ve bi balafiran tê bikaranîn, navê xwe ji dema dîktatoriya Arjantînê (1974–1983) digire: Kesên tên binçavkirin, ji balafir an jî helikopteran ber bi mirinê ve tên avêtin: nav okyanûsan, nav çemên mezin an jî ser çiyayan... Li gorî raporên rêxistinên mafên mirovan û lêkolînên saziyên piştî cûntayê, hejmara kesên bi vî awayî li Arjantînê hatine kuştin, di ser çar hezarî de ye. Bi fermana amîralê cûntayê Luis María Mendía kesên muxalif û şoreşger di bin çavan de bi ilacên tiryakê dihatin bêhişkirin û wan bi saxitî ji balafiran diavêtin nav Okyanûsa Atlantîkê. Ji girtiyan re dihat gotin ku dê wan bifirînin azadiyê. Hin ji rêxistinên malbatên windayan û saziyên dadwerî û li dijî jibîrkirinê li pey şop û doza windahiyan in. Pir kesên berpirsiyar qet nehatin darizandin û hesab ji wan nehat pirsîn.

Ev rêbaza ‘şerê qirêj’ ku navê xwe ji sedema van amûrên bêexlaq û derî mirovahiyê digire, ne tenê pratîka cûntaya Arjantînê ye. Her wiha li Şîliyê di bin dîktatoriya Pinochets (1973-1981) de girtiyên siyasî ji firokeyan dihatin avêtin. Piştî girtî dihatin kuştin, di torbeyan de dihatin veşartin da ku laşên wan neyên dîtin, diavêtin nav okyanûsê yan jî serê çiyayên Andê. Beriya Arjantîn û Şîliyê li Cezayîrê di şerê azadiya Cezayîrê ya li dijî kolonyalîzmê de gerîlayên Eniya Azadiya Neteweyî (1954-1962) ji hêla hêzên fransî yên mêtinger û dagirker ve bi vî awayî dihatin qetilkirin. Lingên qurbaniyan da ku dîsa dernekevin ser rûyê erdê bi betonê dihatin dorpêçkirin. Dîsa di Serhildana Madagaskarê (1947-1949) ya li dijî dagirkeriya Fransayê de bi sedan girtî, jin û sivîl ji balafiran hatin avêtin. Dîktatoriya Mobutu (1965-1997) li Zaireyê hejmareke nediyar qurbaniyan bi firokeyan avêtin nav çem û rûbarên Zaîreyê.

Ev rêbaza dîktatorî û mêtingeriyê ku bêyî darizandina mirovan tê pêkanîn, bi giranî li dijî kesên ku di bin çavan de agahiyên ku tên xwestin nadin, tê bikaranîn. Cudahiyê naxe navbera gelê sivîl û gerîlayan/şoreşgeran û bi vî awayî dixwaze bandora tirsê mezin bike. Her wiha wekî bi mînakên jor jî hat dîtin, di amûrên qetilkirina mirovan de cûnta û mêtingerî bi hev re kar dikin. Ji hev û dinê sûdê werdigirin. Lewma yê her çiqas navê dewlet û teşeya birêvebirinê biguhere jî navê ‘şerê qirêj’ naguhere.

Lê di mijara şerê qirêj de hosteyê hosteyan dewleta tirk e. Tê zanîn tu cûnta û mêtingerî nagihije dawiyê. Helbet li derekê tên sekinandin. Di darizandinên der barê dîktatoriya Pinochets de yek ji qumandarê Pinochetsê li xwe mikur hatinê li wir bihêle, di dadgehê de gotibû: “Xwezî me wan biavêta nav volkanê, dê çêtir bûya.” An jî yên li xwe mukir hatibûn, hemû sûcên xwe li ber dadgehê rave kiribûn.

Di kevneşopiya dewleta Tirkiyeyê de ji firokê avêtin ne mijara îro ye, tê dizanîn. Bi taybetî di şerê li dijî PKK‘ê de dewletê hemû amûrên ‘şerê qirêj’ bi kar tîne. Hem di raporên rêxistina mafên mirovan de, hem jî di şahidiyên leşkerên kevin de ev qetlîam tên bilêvkirin. Dewleta tirk hem çanda xwe ya cûnta û dîktatoriyê û hem jî mêtingeriyê ji çar milan ve li Kurdistanê dide meşandin. Yek cudahiya dewleta tirk a ji mînakên jor di bilêvkirina bûyerê de ye. Tu dewlet û tu cûnta/dîktatorî di vî warî de nikare av li destê wê bike. Pergala xwe li ser berevajîkirin û çewtkirina rastiyan ava kiriye. Li şerê xwe yê qirêj xwedî dernakeve. Hem aşkera ye, him piştperde ye. Walitiya Wanê li ser bertekan di daxuyaniya ku da meşandin de ji bo Server Turgut ku jiyana xwe ji dest da got: “Dema reviya ji zinaran ket.” Wezîrê Karê Hundir Soylu jî gotibû: “Deriyê firokê berî deyne, venabe.”

Divê xwedê dijmin jî bide yê rast û dirust bide, ne yê dekbaz û fêlbaz. Di dema darizandinên xwe de dê ev xwe û bavên xwe tev înkar bikin.



Dîlan Aydin

## Her tişt bê te ye!

Di vê êvara payîzê de li dengê Mîryem Îbrahumpur guhdarî dikim. Dengê wê, hem xemgîniya payîzê, hem jî kêfxweşiya ji bo hatina biharê tîne. Bi dengê xwe yê zelal û azad, bi hunera koma xwe ya bêhempa, xwe di bîr, çav û dilê te de bi cih dike. Ev 20 sal in her ku li wê û Kamkaran guhdarî dikim, tu têyî bîra min. Dizanim tu yê jî pir ji dengê wan hez bikî; ji stranên ku bi hev re dibêjin; ji strana “Bulbulî bal şikawî” ya hem ew bixwe, hem jî Kamkaran dibêjin... Dizanim tu yê jî ji wê strana ku ji risteyên helbesta Hêmin Mukriyanî der hatiye pir hez bikî.

Vê payîzê, demsal bê te dest pê dike... Hesret, bêrî û bendewarî li qonaxên dawî ne êdî! Vê payîzê hêvî careke din xwe dikujin, li sînorê hebûn û tunebûnê ne... Ev bû çi! Temen, bi hezaran hêviyên pêknehatî dagirtî ye, xewn û xeyalên pêknehatî li ber xwekuştinê ne êdî. Rê girtî, aso nexuyayî, îro û sibê nediyar... Zindan e her der. Her carê ji zindanek agahiya mirina kesek... Her rojê wekî bûyerek rojane em navê kesek di dojeha vê cîhanê de mirî hatiye dîtin dibihîzin. Bi her mirinê re şerma zêdetir dibe.

Vê îlonê, hezar car heyfê tinim li van sal û demsalên bê te! Bi her guherîna demsalekê re hêvî vediguherin birînê! Ji pêknehatinê, dibin êş û birîn êdî bi hezaran hêvî! Jiyan dibe jehr, ji ber dûrbûna we ya ji me û demsalan; demsal dibin êş ji ber nedîtin û nejiyîna we ya bi wan re û em jî dibin nebesî, neçarî... Em ‘bi halê xwe yê heyî’ dibin astengî li pêşiya azadiya we! Rewş ev e, tenê xwe bi gotinan teselî dike û dispêre dibetiyên dûr ên pêkhatina wan nediyar.

Rêwîtiya me ya jiyanê ya ku em gelek caran nizanin dê me bi ku ve bibe, di kîjan rê û rûbaran de derbas bike; her demsal di kesayetiya we de, me bi dîmenên ku xwe li ser û çavên me bi cih kirine re rûbirû dihêle! Hûn rastiyek tehl in li pêş çavên me, li dil û bîra me, girêkên neçareserkirî ne. Bîra me; bi dîmenên we yên wekî çûkên di qefesan de hatine dagirtin! Çavên me ji hesreta negihîştina we, westandî ne.

Payîz e êdî, roj bi roj dê pelên daran biweşin, hewa bicemide, bîranîn zindî bibin... Payîz e, gerdûn dê xwe bi rengên kesk û zer bixemilîne, em ê wekî her carê bibin evîndarên vê ahenga bêpênase... Payîz e, hûn li dûr, girtî, di qefesên dagirkeran de, em jî bi dilê xwe yê ji hesreta we dişewite, ji we dûr derbas dikin dem û demsalan...

Dizanim, em pir kêm dikarin we bibînin û fêm bikin di wan zindanan de... Dizanim, ew der ne dikare were dîtin, ne jî vegotin! Loma jî em tenê bi navê ‘berxwedanê’ behsa we dikin û naxwazin û nikarin çend nav û têgehên din jî ji bo we bibêjin. Ji ber ku hûn rastiya herî biêş a vê serdemê ne, em ji we direvin lewre hûn ji ber barê me li erdê hiştiye, di wî halî de ne û em jî ber vê kêmasiya xwe nikarin çend navên din, li jiyana we deynin.

28 bihar, havîn, payîz û zivistan bê te derbas dibin. 28 sal in tu jî hemû rengên demsalan bêpar î; bi bêrî û hesreta dîtina wan î bi şev û roj. Em û hûn bendewarên hêviyên pêknehatî ne hê jî di vê serdema ku her tişt bi saniye û deqîqeyan diguhere! Gelo kî ji me dikare, bi cesaret, behsa ‘van salan’ bike, gotin bi gotin, hevok bi hevok, kela dilê xwe birijîne! Kî ji me dikare, xwe bera binê vê bîra bêbinî ya ku bi hezaran hêviyan daqurtandine bide...

# Bi niyeta Qesrê berê xwe da Qersê!




Hevşaredarê Qersê Ayhan Bîlgen jî di nav de siyasetmedarên kurd ên hatibûn binçavkirin hatin girtin. Qeyûm tayînî Şaredariya Qersê hat kirin. Ji bo nixumandina êrîşan li ber Şaredariya Qersê nimêj hat kirin

Qedrî Esen

Li bakurê Kurdistanê, piştî 6 salan bi hinceta Serhildanên Kobanê yên sala 2014'an, di 25'ê îlonê de li dijî HDP'ê operasyoneke siyasî ya berfireh hat lidarxistin. Operasyon, bi fermana dozgerê ku bi minesabeta deweta xwe çûbû serdana Qesra Erdogan, piştî civîna Lijneya Ewlehiya Neteweyî (MGK), pêk hat.

Serdozgerê ku bi ferman doza hiqûqê dimeşîne, di operasyonê de biryara binçavkirina 82 siyasetmedarên HDP'ê da, lê di operasyonê de piranî jê endamên MYK'a HDP'ê ya demê tenê 20 siyasetmedar hatin binçavkirin. Di operasyonê de parlamenterên berê yên HDP'ê yên mîna Sirri Surreya Onder, Ayla Akad Ata, Altan Tan, Nazmî Gur, Emîne Ayna û Hevşaredarê Qersê Ayhan Bîlgen hatin binçavkirin.

**Bertekên li dijî operasyonê**

Operasyon hefteya borî rojeva yekemîn a Tirkiyeyê bû. Gelek bertek li dijî operasyonê hatin nîşandan. Tevahiya heftê li gelek navendan ji hêla HDP'iyan ve çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin. Ji bilî çalakiyan, bi dehan rêxistinên sivîl û partiyên siyasî serdana HDP'ê kirin û bertekên xwe yên li dijî operasyonê û piştgiriya xwe ya ji bo HDP'ê anîn ziman.

Di vê çarçoveyê de bi sedan kes jî bi armanca bertek nîşandinê serdanên rêxstinên HDP'ê yên navçe û bajaran kirin û bûn endamê HDP'ê. Kesên bûn endam, destnîşan kirin ku ew li dijî zextan dibin endamê HDP'ê û wê destûr nedin ku AKP-MHP bi hêsanî HDP'ê daqurtînin û armancên xwe yên vê der barê bibin serî.

**Piştgiriya muxalefetê**

Cara yekemîn siyasetmedarên tirk ên muxalif ên mîna Serokê Giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû, Serokê Giştî yê Partiya Gelecekê û Serokwezîrê Berê yê Tirkiyeyê Ahmed Davûtoglû û Serokê Giştî yê Partiya DEVA'yê Alî Babacan, li hevserokên HDP'ê geriyan û bertekên xwe yên li dijî operasyonê bi wan re parve kirin.

Serokê Giştî yê Berê yê SHP'ê Mûrat Karayalçin jî li Enqereyê çû Serdana Navenda Giştî ya HDP'ê û li dijî operasyonê piştgiriya xwe ya ji bo HDP'ê rûbirû ji hevserokên giştî yên HDP'ê re ragihand. Karayalçin, di serdanê de destnîşan kir ku ji hêla herkesî ve tê zanîn ku operasyona li dijî HDP'ê siyasî ye û nayê qebûlkirin.

Di hemû çalakiyên ku hatin lidarxistin de û hevdîtin û axaftinên ku hatin kirin de hat destnîşankirin ku operasyona li dijî HDP'ê tu eleqeya xwe bi hiqûqê re tune ye û armanca wê astengkirina tifaqa muhtemel a di navbera muxalefetê de ye.

**Amed û Mêrdîn**

Hê ku ev operasyon bi encam nebûbû, di 30'ê îlonê de operasyoneke din ku navenda wê Amed bû pêk hat. Hinceta vê operasyonê jî lêpirsîna li dijî Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bû. Di vê operasyonê de jî biryara binçavkirina 70 siyasetmedar, wêjevan, rojnameger û hunermendên kurd hatibû dayîn. Di çarçoveya operasyonê de li Amed û Mêrdînê nêzî 30 kes hatin binçavkirin.

Di roja ku ev operasyon pêk hat de Hevşaredarê Qersê Ayhan Bîlgen ku bi hinceta Serhildanên Kobanê hatibû binçavkirin, di bin çavan de ji nişke ve îstifaya xwe ragihand. Ayhan Bîlgen, bertek nîşanî operasyonên li dijî kurdan da û got ku temenê ku bi demokrasiyê were lîstin derbas kiriye û ji ber dengdayîna wan spasiya gelê Qersê kir. Her wiha ji bo Şaredariya Qersê pêşniyara rêveberiyeke nû kir.



**Şaredariya Qersê**

Rojek piştî vê daxuyaniya Bîlgen, bi fermana Serdozgeriya Komarê ya Qersê li dijî Rêveberiya Şaredariya Qersê operasyoneke mezin hat lidarxistin. Di operasyonê de Hevşaredara Qersê Şevîn Alaca, endamên meclisa şaredariyê, endamên meclisa giştî ya bajêr û Hevserokê HDP'ê yê Qersê Cengîz Anli jî di nav de, 19 kes hatin binçavkirin. Di heman rojê de Wezareta Karên Hundir a Tirkiyeyê, li Şaredariya Qersê Hevşaredar Şevîn Alaca û 6 kesên din ji peywirê dûr xistin.

## Nimêja nixumandina xespê

Piştî biryara girtina Ayhan Bîlgen bi çend deqeyan Wezareta Karên Hundir a Tirkiyeyê, Waliyê Qersê Turker Oksuz weke qeyûm tayînî Şaredariya Qersê kir. Walî Turker dema ku çû şaredariya dagirkirî destpêkê li ber şaredariyê nimêj kir û xwest xespkirina xwe ya vîna gelên Qersê bi nimêjê binixumîne. Ji bo vê hewldana qeyûm li ser medyaya civakî gelek bertek hatin nîşandan û nîqaş hatin kirin. Nimêja qeyûm weke nimêja "fethê" hatê pênasekirin. Li Qersê û gelek bajarên din li dijî tayînkirina qeyûm çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin.

Bi desteserkirina Şaredariya Qersê re hejmara şaredariyên HDP'ê yên hatine desteserkirin derket 48'an. Her wiha bi vê re şaredariyên bajêr ên di destê HDP'ê de neman. Tenê şaredariyên 4 navçe û 2 bajarokan di destê HDP'ê de man. Piştî hilbijartinan 6 şaredariyên HDP'ê jî bi hinceta ku hevşaredarên wan KHK'î bûn hatibûn desteserkirin. Tayînkirina qeyûman di 19'ê tebaxa 2019'an de dest pê kiribû û destpêkê şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê hatibûn desteserkirin.

## Piştî hefteyekê ew girtin

Piştî binçavkirina wan, 7 roj şûn de biryarên darazî yên der barê 20 siyasetmedarên de ku bi hinceta serhildanên Kobanê hatibûn binçavkirin de hatin dayîn. Ji siyasetmedaran Gulfer Akkaya, Sirri Sureyya Onder û Altan Tan bi şertê kontrola edlî hatin berdan 17 siyasetmedar jî hatin girtin. Hevşaredarê Qersê Ayhan Bîlgen, parlamenterên berê yên HDP'ê Ayla Akad Ata, Emîne Ayna û Nazmî Gur, Endamê MYK'a HDP'ê Alp Altinors, endamên berê yên MYK'a HDP'ê; Bîrcan Yorulmaz, Berfîn Ozgu Kose, Dîlek Yagli, Can Memîş, Gunay Kubilay, Bulent Parmaksiz, Pervîn Oduncu, Îsmaîl Şengun û Cîhan Erdal, Hesabgirê Giştî yê berê yê HDP'ê Zekî Çelîk, endamê RTUK'ê yê HDP'ê Alî Kurkut û parlamentera berê Prof. Dr. Emîne Beyza Ustun jî hatin girtin.

## Heta goristanê îşkence kirin

Navenda Nûçeyan

Servet Tûrgût ku ji bo debara mala xwe derketibû xebata çandiniyê, ji hêla leşkerên derketibûn operasyonê ve hatibû binçavkirin û piştî îşkenceyeke giran ji hêlîkopterê hatibû avêtin, jiyana xwe ji dest da.

Di 11'ê îlonê de leşkerên ku li navçeya Şaxê ya Wanê derketibûn operasyonê, welatiyên bi navê Servet Tûrgût û Osman Şiban binçav kiribûn. Heta 2 rojan bi tu awayî agahî ji Tûrgût û Şiban nehatibû girtin. Piştre Tûrgût û Şiban li nexweşxaneyeke Wanê derketibûn holê.

**Îşkenceyê hew deyax kir**

Leşkeran li hemberî Tûrgût û Şiban serî li hovîteyeke ku di salên 1990'î de jî nehatibû dîtin dabûn. Piştî îşkenceyeke hovane wan ji helîkopterê avêtibûn. Li gel ku destpêkê ev hat redkirin jî piştre bi raporên nexweşxaneyê hat belgekirin ku Tûrgût û Şiban ji helîkopterê hatine avêtin.

Leşkeran Servêt Tûrgût kiribû rewşeke wisa ku tu dereke wî ya saxlem nehiştibûn. Piştî tedawiya 20 rojan a li nexweşxaneyê, Tûrgût di 30'yê îlonê de jî ber îşkenceya ku lê hatibû kirin êdî hew deyax kir û jiyana xwe ji dest da.

**Li goristanê jî bûn asteng**

Heta roja ku Tûrgût jiyana xwe ji dest da jî dewletê nehişt xizmên Tûrgût biçin cem wî û pirsa wî bikin. Vê hovîtiyê heta ser goristana ku Tûrgût lê hat veşartin jî berdewam kir. Malbata Tûrgût, dema ku cenazeyê Tûrgût girt û bir goristanê, polîsan ji bo malbatê û beşdarên merasîma cenaze astengî derxist. Ji bilî ferdên malbatê nehiştin tu kes derbasî goristanê bibe.

Bi bihîstina agahiya mirina Tûrgût re li gelek navendan, kurdan nêzîkbûna AKP'ê ya li hemberî xwe şermezar kirin û xwestin ku kujerên Tûrgût bên darizandin û cezakirin. Li ser medyaya civakî jî mirina Tûrgût bû mijara yekemîn a Tirkiyeyê û bi sed hezaran kesan bi vî awayî bertek nîşanî hovîtiya desthilatê ya li hemberî kurdan da.

**Wê rastiyê vegota!**

Bertekeke balkêş jî ji parlamenterê Partiya DEVA'yê Mûstafa Yeneroglû hat. Yeneroglû, bi pirsa kîjan wijdan li ber vê xedariyê deyax dike? Bertek nîşanî qetilkirina Tûrgût a bi destê dewletê da. Yeneroglû, piştre ev tişt got: "Heke em dewleta hiqûqê bûna wan kesên ku îşkence kirine wê ji peywirê bihatina girtin, lêpirsîneke bibandor bihata kirin, hemû sûcdaran cezayên giran bigirta. Wezîrê karê hundir jî wê derketina pêşberî çapameniyê, rastiyê vegota û hesab bida."

Birayê Tûrgût Naîf Tûrgût jî li şîna kekê xwe bi gotinên dilsotîner bertek nîşanî hovîtiya li hemberî kekê xwe da û xwest ku zilma li wan hatiye kirin Xwedê qebûl neke.



## EM BI VÊ ŞÊWAZÊ JI BO ÇANDÊ TÊKOŞIN

# Divê ev çand winda nebe

→ Zeynel Bulut

Heta niha kilamên ku me gotine, me ne ji dengbêjan lê ji nav gel bihîstine. Jixwe stranbêj çawa tê hesabê wan bi ekîba xwe ya mûzîkê re kilamên kurdî yên berê hatine gotin tevî bi şaşî dibêjin, lê yê me giş kilamên me yên gelêrî yên kevn in, me ne tişt pê ve kiriye me ne lê zêde kiriye, em wan dibêjin

Şefîq Yilmaz û Xelîl Bayindir kî ye?



Şefîq Yilmaz (45) û Xelîl Bayindir (41) du dengbêj in. Ew ji gundê Tuxlanê yê navçeya Kanîreşê ya Çewlîgê ne. Xelîl li Kanîreşê esnaf e û Şefîq jî bi karê ceyranê re mijûl dibe. Bi mebesta lêvegera li çanda kurdan a kevnare ku winda dibe, wan dest bi projeyekê kiriye. Kilaman bi şêweya ku berê çawa li şahiyan dihatin gotin, bêyî amûrên mûzîkê dibêjin û li hev vedigerînin. Demek e li ser medyaya civakî bala gelek kesan dikişînên



*Demek e li ser torên medyaya civakî du dengbêjên bi navên Xelîl Bayindir û Şefîq Yilmaz, kilamên kevin dibêjin û belav dikin. Ew diyar dikin ku ew dixwazin çanda berê ya kilamên kurdan biparêzin û şêweyên dawetên berê zindî bikin. Me jî xwest ku em ji nêz ve van her du xemxur û dilsozên çanda kurdî nas bikin û xebata wan bi xwînerên xwe re parve bikin.*

***Birayên hêja Şefîq û Xelîl, destpêkê em dixwazin we nas bikin.***

**Şefîq:** Ez bi eslê xwe ji Kanîreşa Çewlîgê me, ji gundê Tuxlanê. Li vî gundî 40-45 sal in dijîm. Min jiyana xwe tev li wir derbas kiriye. Halê hazir em hîna li wir dijîn.

**Xelîl:** Ez û hevalê Şefîq, em ji gundekî ne, gundê Tuxlanê. Em hevalên hev ên zarokatiyê ne û niha jî li Kanîreşê, gundê Tuxlanê dijîn. Dikaneke min a biçûk heye, esnafiyê jî dikin.

***We kengî û çawa dest bi dengbêjiyê kir?***

**Xelîl:** Ez diçûm dawetan, min mêze dikir orkestra filan û hema hema kurdên welatê me tenê dilîstin. Zimanê kevin û kilamên kevin giş ji holê radibûn. Ji lîskandinê ber bi mîsketê ve çûn. Min jî got, em xebateke çer bikin ez û hevalê Şefîq em bi hev re li ser vê meselê fikirîn. Me yekcaran kilamên ji holê rabûne bi hev re digotin, dû ra me li ser malperên civakî belav kir. Sedema vê yekê ew bû, me got bila ev kultura ku ji nav miletê rabûye dîsa bînin pêş gel. Em van kilamên ku dibêjin giş ên kevnare ne, yên ji holê rabûne.

***Tu li ser vê meseleyê çi dibêjî, birayê Şefîq?***

**Şefîq:** Eynî wekî kek Xelîl got wiha ye. Xelîl ji min re got lazim e em vî karî baş bikin û bila zimanê kurdî, zimanê me, kultura me winda nebe. Min jî got kekê Xelîl em bi hev re çi şixul dikin bi hev re bikin qet pirsgirêk nîn e, me dest pê kir. Û pir însan, pir mirov ji kilamên me yên kevn hez kirin; kilamên me pir hatin hezkirin. Em berdewam dikin. Înşellah Xwedê li hev bîne, em ê ji bo kurdan ji bo xelkê xwe hewl bidin da ku zimanê me yê kevn wenda nebe. Em karê xwe wiha berdewam dikin.

***Siheta we xweş be. Ev demeke kurt e me we li ser medyaya civakî nas kirin, lê belê hûn bi salan e dengbêjiyê dikin û vê kevneşopiyê didomînin. Îro di civakê de hûn tên nasîn û hatine asta fenomeniyê. Li ser vê yekê hûn çi dibêjin?***

**Şefîq:** Fenomenî, belê mirov bi giştî ji me re dibêjin hûn fenomen in. Em fenomenên gelê xwe ne. Miletê kurd ê li kultura xwe xwedî derketin wan em kirin fenomen. Kesên li Ewropayê dijîn, ên li metrepolan dijîn giş peyamên pir xweş ji me re dişînin. Dibêjin em xebata we pîroz dikin. Va xebateke herî mezin e, hûn tînin pêş me. Dibêjin we em teze birin welat; we em teze birin zaroktiya me; we em birin evîna me, yanî kêfa wan pir ji me re tê. Li ser malperên civakî li her derê jî me dişopînin. Ji me re alîkariyê dikin, peyamên xweş dişînin. Ez ji birayê xwe re awa bêjim; di dilê însanan de ew kilamên kevn pir mane, yanî giş kêfa wan jê re tînin. Dibêjin em çawa ji we re alîkariyê bikin; em çer bikin hûn vî tiştî pêş ve bibin. We teze van tiştan anî pêş gel, ew ji holê rabûbû, mesela li welatên me bi kom û ekîbên mûzîkê dawet û kilam dihatin gotin; vaye dora çar pênc meh in me dest bi vî karî kiriye. Tu bawer bike ev çend dawet in ez derim wek zemanên berê, salên 90'î diketin destê hev, yekî kilam digot yekî lê vedigerand. Niha jî hêdî hêdî vaye em dest pê dikin ku wê çanda xwe vegerînin şahîyên xwe. Ev yek jî ji bo me kêfxweşî û serbilindî ye.

***Ev tişteke xwezayî bû yan fikrek bû ku hûn pê de çûn?***

**Şefîq:** Di ruhê min de ev yek hebû. Min pir kilam digotin. Ji zaroktiyê heta niha min di dawetan de pir digotin; tim di qelbê min de kilam û gotin hebûn li dawetan be, li her derê min kilam digotin. Yanî pê sebra me tê, pê dilê me xweş dibe.

***Yanî tora civakî ji we re bû amûrek?***

**Şefîq:** Eynî wiha ye. Ew bû amûrek. Rast e dirust e wek mîna ku karek pir qedîm bû bi me xweş bû yanî. Pir tişteke xweş e û gelekî kêfa me jê re tê.

***Niha şêwaza hûn distrên şêwazeke kevnare ye. Bi salan e ev şêwaz hatiye bikaranîn, lê bi derketina enstrûmanên muzîkê bi taybetî piştî salên 90'î dawet veguherîn muzîkê. Piştî ewqas sal, we careke din ev yek zindî kir, di hişê mirovan û civakê de. Yanî we dawetên berê xist bîra civakê. Gelo niha civak li vê şêwaza hatiye jibîrkirin çawa dinêre?***

**Xelîl:** Ez dikarim bejim ji sedî nodê civakê pir bi vî karî kêfxweş e. Te aniha got kilamên kevn, îro ez lê dinêrim kurdên li metrepolan, dawetan bide aliyekî, bi zarokên xwe re bi kurdî naaxivin. Ê li dû vê xebata me, mesela em rojên pêşiyê çûn Stenbolê pir heval hatin hinda me. Ji me re gotin mala we ava be; gotin zarokên me jî we guhdarî dikin, kilamên we bala gelek zarokan jî dikişînin. Gotin em xebata we pîroz dikim. Heta niha kilamên me gotine, tu stranbêjekî negotiye. Jixwe stranbêj çer tê hesabê wan bi ekîba xwe ya mûzîkê re kilamên kurdî yên berê hatine gotin. Giş bi şaşî û hema çer hat kêfa wan wer dibêjin, lê yê me giş kilamên me yên gelêrî yên kevn in. Me ne tişt pê ve kiriye, me ne kêm kiriye. Em ê wiha jî berdewam bikin; em ê xebata xwe jî bêtir mezin bikin. Li welatê Serhedê, berê mesela kal hebûn; diketin dawetan heta sibê kilamên wan nediqediyan. Em aniha gund bi gund derin cem wan; em dibêjin kilamab ji me re bêjin û wiha em sûdê ji wan digirin.

***Hûn dibîhîzin, li ser dixebitin û dibêjin. Li gorî we, muzîka nûjen a niha di civakê de bêtir li pêş e, çi bandora wê li dengbêjî/stranbêjiya gelêrî heye? An jî zirar daye vê çandê?***

**Xelîl:** Pir zirar daye vê çanda kevnar. Mesela ez lê dinêrim, ew kilamên kevn ên dawetên berê, em zarok bûn însanên me yên mezin welatiyan digotin. Ez lê mêze dikim, giş şaş kirine. Yanî dengbêjî jî kuştine; kilamên dawetên berê kuştine; dîroka kevnar jî kuştine, wan giş bi şaşî dixwînin. Lewre em xebata xwe wekî tekoşînekê dibînin, li hemberî xirakirina van stranên me yên kevnar. Em tişta rast a berê li gorî çanda xwe ya kevnar bi pêş dixin. Ez û hevalê xwe Şefîq bi hev re.

***Birayê Şefîq lazim e ku ev şêwaza muzîka kurdî , dengbêjiya kurdî bê parastin, lê wê çawa bê parastin li gorî we? Çimkî îro civak bi rastî jî bi hesreta parastina dengbêjiya kurdî ye ya hûn pê distrên.***

**Şefîq:** Lazim e ku miletê kurd her demê kilamên kevn ê berê bibêje. Li dawetan bibêje, li şînan bibêje da ku winda nebe. Ev pir tiştekî muhîm e. Heke bi zimanê kurdî, kilamên kevn her mirov li dawet û şînên xwe bibêje, dê zimanê kurdî klamên kevn neyên jibîrkirin, dê zindî bimînin. Kurd li her derê bibêjin heke van kilamên xwe dewam bikin dê neyên windakirin. Înşela wê gelê kurd dewam jî bike. Heya ku ji me were em ê bibêjin. Înşela wê piştî me jî gelek kes ji gelê me vê yekê berdewam bikin.

***Em lê dinêrin, li ser torên medyaya civakî hûn baş tên şopandin û kilamên we pir belav dibin. Niha eleqeya gel ji bo xebatên we çawa ye?***

**Şefîq:** Eleqeyeke gelekî baş û xurt heye. Xelkê ji me hez kiriye. Yanî ji vê şêweya me ya resen hez dikin. Yên li me dinêrin, kêfa wan ji me re tê. Dilê wan pir xweş dibe. Dibêjin we tiştekî pir xweş kiriye; kilamên we pir xweş in.

***Bi qasî em dişopînin û dibînin, hûn kilamên xwe li derve, li nav dar û daristanan û li ber çem û golan dibêjin?* Cihekî we yê hûn lê kilam dibêjin heye yan jî hûn tim li derve, li nav gel in?**

**Şefîq:** Na, mekanekî me tune ye. Ez û kekê Xelîl em li cem hev rûdinin, tê bîra me hema em di cih de dibêjin. Kameraya me jî tune ye. Hema tê aqilê me em telefona xwe vedikin û em jê re dibêjin û paşê em li ser înternetê belav dikin.

***Kekê Xelîl, hûn xebateke giranbiha dikin; hûn dengbêjiyê ji nû ve zindî dikin. Ji bo ev kar bi awayekî baş were kirin, ji bo siberojê çi plan û projeyên we hene?***

**Xelîl:** Plan û projeyê me ji bo siberojê pir zêde hene. Em dixwazin vî tiştî pir pir pêş ve bibin. Însanên me yên bêtir xwe di vî karî de bi pêş ve birine dikarin alîkariya me bikin. Rê li pêşiya me vekin da ku em vê xebatê pir zêde mezintir bikin û li her derê belav bikin. Em ji bo vê xebateke xweş dixwazin bikin. Ha ji me çi hatiye? Em dixebitin, kilaman ezber dikin. Ez û hevalê Şefîq em dibêjin û li ser 3-4 çar malperên civakî parve dikin. Em wisa digihînin gel. Înşela ji bo pêşerojê jî ji destê me çi xebat hatibe, di serê me de mejiyê me de çi geriyabe, înşela em ê bigihînin ber destê gelê xwe. Em dixwazin ku vê çanda winda bûye, di nav gelê xwe de belav bikin. Em dixwazin xwe bigihînin gelê xwe yên li metrepolan û li welatên cîhanê belav bûne. Înşela ew ê berdewam bike.

***Alîkariyek an jî derfetek ji we re tê veqetandin heye yan na? Yanî dema ku em lê dinêrin ji bo vê yekê kulfetek lazim e, mesrefek lazim e; ji bo ku ev li ser piyan bimîne, ji bo ku hûn jî kar û xebata xwe bi pêş bixin.***

**Xelîl:** Hin heval li ser malperên civakî dinivîsin, dibêjin hûn bûne fenomen û pere qezenc dikin. Bi Xwedê me ne pere qezenc kiriye ne jî me ji bo pere vî karî kiriye. Xebateke wisa di hişê me de jî derbas nebûye. Xebata me ji bo çanda me, ev a ji holê rabûye însanan ji bîr kiriye, ji orf û adetê xwe derketine. Em li dijî van tevan tekoşînekê dikin û dixwazin wê çandê dîsa bidin jiyîn. Tu alîkariyek me negirtiye. Em her du jî li gund dijîn. Em xebatên xwe bi qasî îmkanên ku di destê me de hene, li gundan û li kolanan bigerin û vî karî pêş ve bibin. Em ji bo vê xebatê dikin. Alîkariya ku em dixwazin ew ên ku li ser vê çandê nivîsandinên wan hebin, kesên xwe pêş ve birine dikarin rê li ber me vekin, ev tişt ji bo me dewlemendî ye.

Dawî jî em silavên xwe yên germ ji wan re dişînin. Daxwazên wan hebin dikarin ji me re peyaman bişînin. Kêmasiyên me hebin dikarin bêjin. Rexneyên xwe dikarin binivîsin. Li ser medyaya civakî jî dikarin binivîsin. Înşela em ê xebatên xwe mezintir bikin.

Ez xebata Xwebûnê jî pîroz dikim. Serkeftinê dixwazim ji bo we.

# Raman, wêje û du lingên pînik ên mirîşkan

Seyîdxan Anter

Dengbêj û hunermendê muzîka rapê Şakiro, di kilama ***EMRO*** de wiha dibêje: "Ez çûme Helebê dîkê serê sibê li min xul-xuland." Li vir dîk qasidê berbangê ye.

Ger me bala xwe dabê, serçopîyên govenda Amedê, pîkola dîkan dikin û hindik dimîne ku bifirin jî. Serçopî mina dîk huner û merîfetên xwe ji beşdarên govendê û temaşevanan re pêşkêş dike.

Nivîskar û helbestvanê Îngilîz D.H. Lawrence ku Salih Agir Qoserî bi navê "***Zilamê Mirî***" wergerandîye kurdî, bi vê metaforê dest bi romana xwe dike: "Gundîyekî nêzîkî kudsê, ji xwe re dîkekî hûrik û gevçilî peyde kiribû; her ku ber bi biharê ve diçû û darên hejîran dibişkivîn û êdî pelên xwe vedikirin, xeleka porteqalîyî dora stûyê dîk, ezametek mezintir dida wî cesûrtir xuya dikir." Rê ji gotina zêde re nemaye.

Ji ber wesfên dîk ê wek çavderê civatê (cemhete) û parêzerê bawerîya xwe, li jora gelek kiliseyan (dêr) dîk çikandine. Dîk wiha danîne ku ba ji kijan alive tê dik berê xwe dide heman alî û ev yek jî tê wateya ku dik li dijî nebaşîyê radiweste.

Di serdema şerê nav xwe yê li Spanyayê (1936- 37) de bi helbesta Josê Antonio Ferlosio ku Jacob Branting bi ***Den svarta tuppen*** (dîkê reş) wergerandiye swêdî da du core reng dane wan:

•Dîkê reş, gava ku tu bang didî û dengê te tê me, roj dibe tarî û şev dide dû.

•Lê çaxa ku dikê sor bang dide em dibin şahidên berbang û ronahî bi dûvde.

Trabadurê swêdî (ku bi eslê xwe holandî ye) Cornelios Wreswîk jî dîk û mirişk kirine rojeva xwe. Ji ber kêf û kirinên xwe nav li dik nekiriye lê navê mîrîşkê "Magda" daniye. Ma nej i xwe, mirîşk hêka dike, kurk dikeve, xwedî li çêlîkên xwe derdikeve û …

Gelek pesin û saloxên dîkan hene. Mîna Keyên ku peykerên wan li hemû bajar û bajorêken cîhanê hene, dîk jî patrîarkal e.

Şexmûsê Hesarî yê ji Xerzanê, ango helbestvanê me yê hêja û naskirî Cegerxwîn, bi saloxdanên dîk, çûk û ajalên din, pêwendîyên polîtîk, civakî û psîkolojîk ên serdemeke kurdan vedibêje.

Havîna par, dema ku li Kitêbxaneya Kurdî - Stockholmê, beşdarî civîna nasandina pirtûkan bûm. Ev helbesta li jêr hat bîra min û çaxa min helbest xwend, ne tenê Kurdistan lê careke din Stockholm hat hişê min. Îca rê bidin min ku ez bi helbestekê dawî li nîvîsa xwe bînim û Cegerxwîn jî bi bîr bînim bi çend malikan ji helbestekê.

***AZADÎYA DÎK Û MIRÎŞKAN***

***Li welatê me xerza,***
***Dîkek hebû şareza.***
***Rokê çû nava dîka,***
***Ji wan re go hêdîka:***

***Rabin bêjin mirîşkan,***
***Bes xwe bidin enîşkan.***
***Dîk û mirîşk bûne kom,***
***Berê xwe dane cem bûm.***

***Ez im paşa ez im mîr,***
***Ez im şahê cihangîr.***
***Bazî çû cem dîkê dî,***
***Dî ko ew jî wekî wî.***


***Tevan go paşa û mîr,***
***Kesî nego ez wezîr.***
***Nefer bûne yûzbaşî,***
***Heta giha ê paşî.***

***Go tev paşa û mîr in;***
***Bê wezîr û gizîr in;***
***Bûm hêdî rabû serxwe,***
***Taca xwe da serê xwe.***

***Ê ko kuştin ê ko man;***
***Hatin gundan bê goman.***
***Wan jî weke me kurdan,***
***Destê xwe jiber xwe berdan.***

***Elok û tûtik û qaz,***
***Tê de bûne belengaz.***
***Tev de ketin koxê rêş,***
***Çîroka me ji we re xweş.***

***Wek seydayê Cegerxwîn,***
***Hemî bûne dilbirîn.***



# Hiş çi bû?

Dilbirîn Dilo

Ji nişkê va rabû ber bi derî ve çû; ji yên li dora wî kesê tiştek ji wî fêm nekir, lê bi rewşa wî zanibûn tiştên hatibûn serê wî. Xorto qet ji wan haydar nebû kî li dora wî ye, çi dikin, çi nakin qet wî eleqedar nedikir, ji ber ku kes ne di hişê wî de bû. Di hişê wî de fikir û xeyal û bîranînên ku tenê wî eleqedar dikin hebûn; tenê ew û êşên wî di hişê wî de hebûn. Jixwe xorto tim û tim wîsa bû. Civata ew tê de bûya bi kesê re nediaxivî; bi tiştek re mijûl nedibû tenê difikirî. Kes nizanibû bê ka çi di hişê wî de heye, tenê ew zanibû tiştên di hişê xwe de.

Xorto dema ji nav civatê rabû derket der û çû ber bi çiyê ve, mîna ku yek gazî wî bike û bibe wan deran, mîna lingên wî bêyî xwesteka wî, wî bibin...

Heta ku wê meseleya bêbav, bêbext nehatibû serê wî ew ne wisa bû; gula civatan bû, bêyî wî tu kêf di civatan de nebû. Heke ew nebûya du kes jî nedihatin ba hev û wext bi hev re derbas nedikirin, çimkî xorto bi henek û devkenîn bû; ji civatê re tiştên xweş digotin dilê wan xweş dikir ew didan kenandin.

Xwezî ew roja reş nebûya ew bobelat nehata serê wî!

Serê sibê zû ew û bavê xwe bi banga mela re rabûn ku herin bajêr. Xorto pir bi kêf bû, fîkefîka wî bû; şûr simêlê wî nedibirand hingî bi kêf bû. Di dilê xwe de bûbû mêrekî mezin ku êdî diçe hewceyiyên malê li bajêr dikire. Emrê wî bûbû 18. Hê jî wî bajêr nedîbû. Îcar him ji kelecanê him jî ji fediya bavê xwe sor û sorçiko bûbû. Hespê xwe dabû piştî bavê xwe û difikirî; wê biçûna bajêr, dikan bi dikan wê bigeriya wê pir însan bidîta. 'Elî wexta çûbû bajêr dîtibû, ji wî û hevalê wî re tim û tim qala bajêr dikir. Carkî gotibû însanên temamê dinyayê li bajêr in her kes li wir e, wî jî meraq dikir, lê nizanibû ku wê çi bê serê wî yê nerm û ter.

Li ser rêya wan, leşkerên dagirker sekinîbûn, ew û bavê xwe rastî wan hatin.

Yekê ji tevger û qam û qilafet û rutbeyên li ser milê wî dihat zanîn ku serleşker e;

- Hûn ji ku tên bi ku ve diçin?

Bavê xorto: Em ji gund tên, em diçin bajêr.

Serleşker: Hûn ji kîjan gundî ne?

Bavê xorto: Em ji Qediştê ne.

Serleşker dema navê gund bihîst çêrê wan da û ew ji hespên wan peya kir û li wan da:

- Kûçikana, segbavana hûn li dijî dewleta me, leşkerên me, gelê me xebatan dikin ha, kûçikbava ma hûn nizanin hûnê nikaribin ti gûkî jî bixwin?

Bavê xorto bi tirs û lerz û bi lava: Na ezbenî wele em li dijî kesê xebatan nakin .

Serleşker bi hêrs: Hûn kê dixapînin segbavana kûçikana?

Ew avêtibûn erdê û him li wan didan him jî çêrê wan didan.

Tirseke bêhempa ketibû dilê xorto; ew kelecanî û kêfxweşî cihê xwe ji tirs û neçariyê re hiştibû. Bi piranî jî li bavê wî didan, ji ber ku êdî zanibûn bavê wî jî ji mezinê gund e û têkiliyên wî bi hinek welatparêz û xebakarên dilsozê welat re hene.

Xorto xwe avêt ser bavê xwe û bi dengekî mirov zane ji dilê şikestî û neçar tê kir qêrîn:

- Li bavê min wî tiştek nekiriye.

Lê leşkeran tiştek jê fêm nedikir, ji ber ku xorto tenê bi zimanê xwe dizanibû; neçûbû dibistanê û kesên biyanî jî nas nedikirin ku pê re bi zimanê wan biaxivin, loma nizanibû bi zimanê wan.

Wan xorto ji ser bavê wî rakir û avêt cemsa leşkerî. Xorto li ber pencerê dan rûniştin, tiştinan jê dipirsîn lê aqil û hişê xorto ne li wan bû; nikaribû çavên xwe yên bihêsir ji bavê xwe yê li erdê û sê leşkerên lê didin vezivirîne bi derek din.

Leşkeran çiqas li bavê xorto dida, ewqas jî bavê xorto dixwest xwe bigihîne cemsê. Bi kaşkaşê ber bi cemsê ve diçûn lê bê fêde bû. Leşkeran lê dida û ew li dûv xwe kaş dikirin. Xorto van lêdan û gevizandinê tev da didît û ji hêrsa dikir xwe perçe bike; xwe li rast û çepê cemsê dida, du leşkerên têrşîr jî nikaribûn wî zeft bikin.

Xorto hê jî diqêriya:

- Li bavê min nedin, wî tiştek nekiriye.

Êdî leşkeran mêze kir tu çare tê de nedîtin, dest bi lêdana wî jî kirin. Serleşker nedixwest li wir zêde li xorto bide, dixwest tenê bila êşa bavê xwe bibîne û bitirse da ku her tiştî bibêje, lê xorto nesekinîbû ev lêdana ku li bavê wî didin qebûl nedikir; xwe radikir li erdê dida û dikir qêrînî. Leşkeran li wî jî da lê ti êş hîs nedikir tenê diqêriya û digot:

- Li bavê min nedin wî tiştek nekiriye.

Heta hatin qereqolê jî hêna jî diqêriya. Ji bilî bavê wî tiştek di hişê wî de nemabû.

Heta mehekê li îşkencexaneya qereqolê îşkence dikişand û heqaret lê dihat kirin lê tim û tim wî digot:

- Li bavê min nedin wî tiştek nekiriye.

Lêdan dixwar, çêr lê dihatin kirin, nedihiştin kes wî bibîne. Piştî mehekê hat fêmê ku nikarin ti tiştek ji wî bigirin, ew ji îşkencê derxistin. Derekî wî yê sax nemabû her derê wî birîn bû û diêşiya. Ew bi vê halê wî birin li nêzê gund berdan, lê xorto bêtaqet bû, birçî bû, tî bû her derê wî diêşiya. Xorto heta hate malê bûbû êvar.

Dema çû malê berî her tiştî pirsa bavê xwe kir, lê dayika wî ya reben çong da û dest bi girîn û hawar û qêrînê kir; hem ji bo kurê xwe him jî ji bo mêrê xwe.

Leşkeran wê roja bêbext bavê xorto kuştibû. Tiştê herî dawî ku xorto bihîst ev bû, êdî ti tiştî ew hişyar nekir, bû termekî biruh.



# Armanca vê dorpêçê çi ye?

Navenda Nûçeyan

**Ev demek e Hikûmeta Başûr Kurdistanê li ser sînorê Rojava nêzî 40 xalên leşkerî ava kirin, cebilxane û çekên giran li ser sînor bi cih kirin**

Ev demek e, hikûmeta başûrê Kurdistanê li ser sînorê Rojava pêşmergeyan bi cih dike û nêzî 40 xalên leşkerî li herêma Fîşxabûr a li hemberî sînorên Rojava ava kirin û cebilxane û çekên giran anîne herêmê.

Berê jî di bihara 2014`an de jî, pêşmergeyên başûrê Kurdistanê bi dirêjahiya 40 km li ser sînorên rojava-başûrê Kurdistanê xendek kolandibûn. Di tîrmeha 2015`an de jî bi firehiya 3 metreyan û kûrahiya 2 metreyan û dirêjahiya 37 kmyî li ser sînorê di navbera Şengal û rojavayê Kurdistanê de xendek kolandibû.



Ev yek ji bo xelkê rojavayê Kurdistanê dibe cihê fikaran û bi taybetî jî ji ber rayedarên başûrê Kurdistanê der barê vê mijarê de tu agahiyan nadin, fikarên xelkê li herêmê zêdetir dibin.

Bi rastî jî di demekê ku êrîşên li hemberî Heftanînê berdewam dikin û nakokiyên ji bo mijara statuya Şengalê tê nîqaşkirin, kiryareke wiha wekî dorpêçkirinê tê dîtin û gelek fikaran bi mirov re çêdike.

**Sînorên Başûr û Rojava**

Der barê mijarê de sekreterê Giştî yê Partiya Demokratîk a Kurdî Cemal Şêx Baqî wiha dinirxîne: “Me digot dê diyaloga kurdî-kurdî Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Başûr nêzî hev bike, lê belê wekî me sewqiyatên li ser sînor dîtin, berevajiyê vê yekê pêk hat.”

Şêx Baqî her wiha dibêje: "Tu wateyek cografîk a sînorên di navbera başûr û rojavayê Kurdistanê de tune ye.”

**Diyaloga kurdî-kurdî**

Şêx Baqî gumanên xwe yên der barê vê rewşê de wiha tîne ziman: "Ez bi hêvî me ku şaş bim. Em bi yekitiya kurdî re ne. Her wiha dixwazim ku tu kes diyaloga kurdî-kurdî mîna rêbazekê wekî zexta li ser destkeftiyên Rojava bi kar neyne. Her wiha bila di mejiyê me de pira diyaloga kurdî-kurdî ku lîstokeke ji bo hilweşandina destkeftiyên Rêveberiya Xweser çênebe û bila ev diyalog nebe hespê troyayê ku di hundir de tirs hebin.”

**Planên parçekirina Başûr**

Şêx Baqî li ser konsepta giştî ya li dijî destkeftiyên kurdan ên ku tên birêvebirin ve jî wiha şîrove dike: "Çawa ku li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji hevdu hatin qutkirin dewleta tirk dixwaze ku li Başûr jî destpêkê ji Zaxo heta bi sînorê başûr û rojhilatê Kurdistanê parçe bikin û bikin du herêm. Herêmek tê de herêmên Qendîl û Heftenînê hebe da ku ji herêmên dîtir ên başûr bê qutkirin û ya duyemîn jî ji Zaxoyê heta bi Şengalê qut bikin da ku têkiliyên Rojava bi Başûr re bên qutkirin."

Bi her awayî wiha xuya dibe ku ev amadekariyên li ser sînorê başûrê Kurdistanê ne nîşaneyên xêrê ne û tevî ku ev yek bi gelek awayan ji rayedarên başûrê Kurdistanê tê pirsîn jî heta niha tu bersiv nehatiye dayîn.

# ‘Peywendiya hikûmeta Başûr û Tirkiyeyê li ber yekitiyê asteng e’

Her diçe êrîşên hewayî yên artêşa tirk li dijî deverên Herêma Kurdistanê zêde dibin. Li ser vê yekê jî rayedarên hikûmeta Herêma Kurdistanê li pey hev tên Tirkiyeyê û serdanan dikin. Piştî van hevdîtinan jî êrîşên bomberanê li ser deverên herêmê zêde dibin.

Der barê mijarê de Hevseroka Nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê Muzeyyen Guneş axivî.

Guneş diyar kir ku têkiliya hikûmeta Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê li ber yekitiya kurdan asteng e û Tirkiye dixwaze herêmê bixe bin kontrola xwe û wiha got: “Têkiliya hikûmeta Başûr û Tirkiyeyê li ber yekitiya kurdan astengiya herî mezin e. Ev nêzîkatî zêde zirarê dide gelê herêmê. Peywendiya di navbera her du aliyan de ne ji bo parastina deskeftiyên gelê kurd e. Lihevkirina hin tiştan xaka herêmê dixe xetereyê. Polîtîkayên hikûmeta herêmê ber bi siyaseta Tirkiyeyê ve diçe û heman siyasetê dimeşîne.”

Di axaftina xwe de Guneş diyar kir ku xelkê herêmê li dijî nêzîkatiya hikûmeta herêmê bi bertek e û got ku êdî tehemûla xelkê li dijî nêzîkatiya hikûmetê nemaye û wiha bi dawî kir: “Tişta herî pêwîst yekitiya neteweyî ya kurdan e. Beriya her tiştî divê kurd xwedî li vîna xwe derkevin û yekitiyê saz bikin. Êdî dem dema avêtina gavên yekitiyê ye.” ***HEWLÊR***



# ‘Bila kurd werin cem hev’

Serokê Giştî yê Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP) Sînan Çiftyurek der barê geşedanên dawî yên li başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê û yekitiya neteweyî de axivî.

Çiftyurek di axaftina xwe de bal kişand ser êrîşên Tirkiyeyê yên hundir û derveyî welêt û wiha got: “Rewşa Tirkiyeyê roj bi roj xerabtir dibe. Betalî û dowîz firiya, aborî xerab bû. Di hundir de serweriya hikûmetê kete tengasiyeke mezin. Tirkiye li derve jî li Lîbya, Idlib, rojhilatê deryaya Spî û li Kurdistanê siyaseta sêva sor dimeşîne. Ev siyaset xetimî. Li her derê tenê ma. Li ser van bûyeran Lijneya Ewlehiya Neteweyî (MGK) du peyam dan. Gotin ‘li derve em siyaseta aştiyê û diyalogê dixwazin’ lê di hundir de peyama êrîşê da. Bo HDP’ê çalek kolan lê ew bi xwe ketin wê çalê. Cara ewil e HDP ji gelek partiyên Tirkiyeyê piştgirî digire. Tifaqa cumhur tenê ma.”

Çiftyurek diyar kir ku Tirkiye çiqas li siyaseta derve bixitime jî statuya Başûr û Rojava qebûl nake û destnîşan kir ku kengî li derve dikeve tengasiyê li hundir êrîşî siyaset kurdan dike.

Di axaftina xwe de de Çiftyurek bal kişand ser yekitiyê û got ku heke tifaqa neteweyî pêk were dê li dijî êrîşên Tirkiyeyê gel jî li kolanan bertekan nîşan bide.

Li aliyê din, Çiftyurek xwest ku hikûmeta Başûr li dijî êrîşên Tirkiyeyê helwestekê bigire û gavên bihêz biavêje.

Çiftyurek bal kişand ser hewldanên yekitiyê yên li Rojava û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ger hewldanên yekitiyê li Rojava bi ser bikevin, dê gelek tişt werin çareserkirin. Em wek KKP’ê bi salan e dibêjin divê di nav kurdan de rêya demokratîk û aştiyê vebe. Kî dixwaze kongreya neteweyî were avakirin divê nêzîkî hevdu bibin. Gava li Rojava hatiye avêtin gaveke girîng e. Divê di meseleya Şengalê de jî her du partiyên me werin cem hev.” ***AMED***



*Mem Avba*

## Bi şerxwaziyê heta ku derê serfirazî!

Dewleta tirk hebûna xwe bi şer û êrişkariyê didomîne. Li hundir şer, li derve şer, bi gel û cêwaziyan re şer, bi cîranên xwe re şer, bi her kesî re şer… Êdî wisa bûye ku li cîhanê, nexasim jî li Rojhilata Navîn li ku derê pevçûn û rageşiyeke biçûk jî derkeve, dewleta tirk tê bîra alemê.

Dewleta tirk ku ji aliyê zilhêzan ve ji bo pêkanîna berjewendî û polîtîkayên pergalê hatî avakirin, vê hêza xwe bêguman ji pergala netewe-dewletê digire. Sedsala borî li ser înkar, çewisandin, bişaftin û qirkirina gel, çand, bawerî û neteweyên vê xakê, bi feraseta yekperestî hat avakirin û îro jî vê rola xwe dilîze.

Ji bo ku ev hişmendiya desthilatdariya tirk jê re guncav e, zilhêz weke leşkerê xwe çi li herêmê, çi jî li cîhanê bi kar tînin, weke çovê tirsê, şûrê Demokles li ser alemê dihejînin!

Di hundir de faşizm û qirkeriya vê ferasetê gihîştiye wê radeyê ku dijminatiya li dijî kurdan êdî bê hed û hidûd e. Pîvan, rêgez, exlaq tu tiştekî nas nake. Dijminatiya bi armanca qirkirina siyasî, civakî gihîştiye wê astê ku êdî hebûna kurdan bi awayekî bêarî tê gotûbêjkirin! Li Tirkiyeyê ji bilî kurdên azadîxwaz ku têkoşîna xwebûnê didin, hemû alî hatin tasfiyekirin, dîlgirtin, lê kurdan bi berxwedanê xwe parast û bûn hêz.

Siyaseta dewleta tirk a şerxwaz, xwe gihandiye wê astê ku xwefiroşiya xwe li hemberî efendiyên xwe ku hefsarê wê di destê wan de ye, weke qozekê bi kar bîne. Piştî ku li welêt pêvajoya qirkeriyê heta asteke ku bikare di kontrolê de bigire anî, vê carê şerê xwe berbelavî herêmê kir. Destpêkê li ser navê ‘ez li hemberî Tevgera Azadiya Kurdistanê şer dikim’ êrîşî destkeftiyên Rojava kir. Tişta ku nekarî li Kobaniyê bike, ji Efrînê dest pê kir, heta Serêkanî û Girê Spî berbelavî qadeke fireh kir. Mîna ku henekên xwe li nirxên mirovahiyê bike, ev hovîtiya xwe di bin navê ‘şaxê zeytûnê’ û ‘kaniya aştiyê’ de pêk anî.

Ji bo ku misogeriya hebûna xwe li ser şer û qirkirina gelê kurd dibîne, êrîşên xwe bi Rojava ve jî bi sînor nekir û berê xwe da başûrê Kurdistanê. Ev êrîşên xwe ne tenê herêmên sînorî yên di bin serweriya gerîla de, berbelavî başûrê Kurdistanê, ji wir heta Şengal û seranserî axa Iraqê kirin.

Li aliyê din, li Lîbyayê şer derxist û bi çeteyên ku li dora xwe kom kiriye, xwest Lîbyayê bixe bin serweriya xwe. Bi wê re jî sînordar nema, li herêma deryaya Spî xwest ber bi Ewropayê ve vebe, lê belê Ewropayê bi pêşengiya Fransayê pêşî lê girt. Di vê siyaseta xwe de jî bi ser neket û neçar ma bêyî tiştekî bi dest bixe paşde vegeriya.

Ji bo ku di siyaseta xwe ya dagirkeriyê ya li Sûriye, Lîbya û bi giştî li herêmê têk çû, berê xwe da hundir û xwest têkçûna xwe dîsa bi êrîşkariya li dijî kurdan ser binixumîne.

Li aliyekî li welêt êrîşî destkeftiyên gelê kurd kir, li aliyê din ji bo ku înîsiyatîfa xwe ya li herêmê ji dest nede, di qada lîstokê de bimîne, civaka xwe û raya giştî ya cîhanê bixapîne, dest bi şerekî nû kir: Şerê Azarbeycan-Ermenistanê! Ango bi terora li dijî HDP’ê bersiv da pêngava KCK'ê ya ‘Bes e ji tecrîd, faşîzm û dagirkeriyê re; dem dema azadiyê ye’. Bi şerê Ermenistan-Azarbeycanê jî hewl da di qada lîstokê de bimîne.

Baş e gelo bi rastî jî hêzeke navdewletî nîne ku vê bêperwatî û hovîtiyê bide sekinandin? Mixabin na! Çimkî çavkaniya vê hovîtiyê ev pergal bixwe ye. Feraseta modernîteyê çawa ku di serdema navîn de li arenayê gladyator didan şerkirin û weke filmekê lê temaşe dikirin, niha jî xwedî heman hişmendiyêne û di vî Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de dewleta tirk gladyatorê pergalê ye…

Gelê kurd heta niha tu destkeftî bi hêsanî bi dest nexistine. Heke di vê pêvajoya ku kurd bi giştî di dorpêça qirkirinê de ne, nikaribin di asta neteweyî de yekitî û aştiya xwe pêk bînin; di asta navneteweyî de hebûn û statuya xwe misoger bikin, dê çerxên pergala qirkirinê bileztir bizivirin!

Li hemberî van êrîşan lawaziya kurdan, parçebûna wan e. Çawa ku êriş bê cudatî topyekûn bin, divê kurd jî wisa yekrêz û yekpare bin ku bikaribin vê pêvajoyê bi serfiraziyê tacîdar bikin û pergala qirkirinê têk bibin.

# Bêyî çareserkirina doza kurdî aştî nabe

Aliyên çepgir ên Kurdistanê diyar kirin ku Kurdistan bêyî vîna gelê xwe hatiye parçekirin û bêyî çareseriya doza kurdî ne pêkan e ku li Rojhilata Navîn aştî û ewlehî misoger bibe

Navenda Nûçeyan




Aliyên Kombûna Çepgirên Kurdistanê daxuyaniyek ji bo raya giştî û Kurdistanê da. Di daxuyaniyê de geşedanên li Kurdistanê hatin nirxandin û bang li hikûmetan tê kirin ku papendê peymana mafên mirovan û mafên gelan bibin û rêzê ji mafên gelê Kurdistanê yê li her çar parçeyên Kurdistanê re bigirin.

Daxuyanî wiha ye: “Em aliyên Kombûnên Çepgir ên li Kurdistanê we agahdar dikin ku divê hûn bi rêya navendên biryaran li rewşa Kurdistanê haydar bin û hûn ji vê yekê de berpisyar in.

Li Kurdistana Bakur hikûmeta tirk her tim êrîşên leşkerî pêk tîne; azadiya gelê li Tirkiyê diçewisîne; ji ber siyasetên şaş ên desthilatê aloziya aborî xwe daye der û bandoreke neyînî li jiyana zehmetkêşan dike. Desthilata tirk dixwaze aloziya li welatê xwe derxîne derveyî sînorên xwe û hewl dide li herêmên deryaya Spî û şandina hêzên leşkerî ji Sûriye û Lîbyayê re aloziyê kûrtir bike, bi Qibirs, Yewnanistan, Fransa û bi Yekitiya Ewropayê re pirsgirêkan derxîne, gund û bajarên Kurdistana Başûr û deverên din ên rojavayê Kurdistanê dagir bike... Ev tev de ji bo ku pirsgirêkên xwe yên navxweyî veşêre û nehêle raya giştî ya Tirkiyeyê bibîne.

Li rojhilatê Kurdistanê jî Komara Îslamî ya Îranê siyaseta dagirkirinê, dorpêçkirina Kurdistanê, li dijî çalakgeran biryarên darvekirinê û zexta li sivîlan berdewam dikin. Di heman demê de gefan li başûrê Kurdistanê dixwe. Destwerdana kar û barên Iraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê dike û ev jî bandorê li ewlehiya herêmê dike. Mafên mirovan binpê dike û demokrasiyê tune dike.

Li rojavayê Kurdistanê jî cendirmeyên Tirkiye û milîsên tundraw ên girêdayî wê li herêmên Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê li pêşberî hêzên Koalîsyonê, dewletên zilhêz û Rûsyayê sûcên qetilkirin û revandinê pêk dike. Ev hêz li gorî berjewendiyên xwe aloziyê derdixin. Di heman demê de ji aliyên kurdistanî yên li Rojava ji diyalogan dûr bixînin û mafên neteweyî yên gelê kurd, diyarkirina sîstemeke siyasî ji Sûriyeya pêşerojê re û garantiya wê keysbaz bikin, kar û xebatê dikin.

Li gel vê yekê li başûrê Kurdistanê jî siyaseta guhartina demografiyê û erebkirina herêmên Kurdistanê yên derveyî rêvebebriya herêmê berdewam e. Desthilata milîsên Heşdî Şebî, hêzên şovenîst û tevahiya biryarên pê ve girêdayî tevî ku destûr pêk neanîn û hikûmetên navendî mafên gelê Kurdistanê înkar dikin. Ji 2014`an ve herêm mûçeyên wan nadin û siyaseta girtina çalakgerên sivîl, li navendê û başûrê Iraqê tunekirina wan berdewam e.

Rewşa her çar parçeyên Kurdistanê ji ber rewşa siyasî hate guhartin û bi diyardeya vîrûsa koronayê re rewşa gel kambaxtir bû û dîsa jî desthilatên her çar parçeyan alîkariya herêmên Kurdistanê nekirin."

Partiyên daxuyanî daye ev in: KKP Bakur, PSK Bakur, KKP Rojava, Kombûna Zehmetkêşên Kurdistanê (Rojhilat), Tevgera Demokratî Kurdistanî (Başûr), Partiya Zehmetkêşên Kurdistanî (Başûr) û Partiya Komunîst a Kurdistanê (Başûr) û Partiya Kominîst a Kurdistanî (Başûr).




## Navê Hevrîn Xelef di nav lîsteya navneteweyî de cih girt

Navê jina siyasetmedar Hevrîn Xelef weke jineke xwedî bandor ku mohra xwe li dîrokê daye di nav lîsteya Komeleya Mafê Jinan a navneteweyî de cih girt.

Komeleya Mafê Jinan (AWID) di sala 1982'yan ji bo hevsengiya hiqûqê, parastina hiqûqê, jinê, edaleta di navbera jin û mêr de, hat damezrandin. Di nav arşîva vê komeleyê de 450 jin ji tevahiya welatên cîhanê weke jinên xwedî bandor û mohra xwe li dîrokê dane hatine hilbijartin. Yek ji van jinan jî Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê Hevrîn Xelef a ji aliyê komên girêdayî dewleta tirk ve hat qetilkirin e.

Di nav vê arşîvê de 450 jinên siyasetmedar, hiqûqnasên ku ji 88 welatên cîhanê hatine hilbijartin hene. Di nav arşîvê de ji jinên kurd heta jinên ereb jî hene û herî dawiyê Hevrîn Xelefa ji aliyê komên dewleta tirk ve hatibû qetikirin jî tev li vê arşîvê kirin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê Hevrîn Xelef di12'ê cotmeha 2019'an de ji aliyê komên girêdayî dewleta tirk ve bi kemîneke plankirî hat hedefgirtin û di encamê de jiyana xwe ji dest da û bû xeleka guhertineke nû ya Sûriyeyê.
***WASHINGTON***

## Li Rojhilat binpêkirinên Îranê!

Bi salan e di navbera sînorê bakur û rojhilatê Kurdistanê de kolber dibin hedefa hêzên dewleta tirk û Îranê. Her sal bi dehan kolber ji aliyê van her du dewletan ve tên qetilkirin û birîndarkirin.

Ji bilî qetilkirina kolberan li Îranê binpêkirina mafên mirovan di asta herî jor de ye. Her roj kesek ji ber fikrên xwe yên cuda yan tê darvekirin, an biryara darvekirinê tê dayîn an jî cezayên bi salan li wan tê birîn.

Têkildarê mijarê Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê (KMMK) rapora xwe ya meha îlonê aşkera kir.

Li gorî raporê di meha îlonê de, kurdê bi navê Xidir Feqî Dil li girtîgeha Urmiyeyê hatiye darvekirin û welatiyek din jî li heman girtîgehê ji ber krîza dil û nebûna çavdêriya bijîşk jiyana xwe ji dest daye.

Li gorî raporê di meha îlonê de di êrîşên leşkerên Îranê de 6 kolber û kasibkaran jiyana xwe ji dest dane û 18 kes jî birîndar bûne.

KMMK’ê ragihand ku di meha borî de artêşa Îranê 6 kesan qetil kirine ku 3 kes endamên partiyek kurd bûne.

Li gorî komeleyê di meha îlonê de 9 kesan dawî li jiyana xwe anîne, yan jî hatine kuştin û ji van 2 zarok û 2 jin in.

Her wiha komeleyê ragihand ku di meha borî de 33 welatiyên rojhilatê Kurdistanê ji aliyê hêzên Îranê ve hatine binçavkirin û piraniya wan ‘bêyî sedem û bêyî biryara dadwer, piştî heqaret û îşkenceyê’ hatine binçavkirin. ***TEHRAN***





## Rêberê olî koça dawî kir

Rêberê olî yê civaka êzidî Bavê Şêx (Xerto Hacî Îsmaîl), li nexweşxaneyeke Hewlêrê koça dawî kir.
Rêberê olî yê civaka êzidî Bavê Şêx yê temen 87 salî, li nexweşxaneyeke bajarê Hewlêrê ji ber nexweşiyê koça dawî kir.
Bavê Şêx beriya çend rojan dema ku nexweş ketibû, ew rakiribûn nexweşxaneya Dihokê, piştre jî ji bo nexweşxaneyek Hewlêrê hatibû veguhestin.
***HEWLÊR***



## Atîna: Ew peyman ne rewa ye

Yewnanistanê daxuyand ku ragihandina dewleta tirk a qeydkirina peymana sînorê deryayî bi Lîbyayê re, li gel sekreteriya giştî ya NY’yê ne rewa ye. Li gorî çavkaniyên dîplomatîk ên Yewnanistanê qeydkirin û belavkirina tevahî cureyên peymanan ku dewlet pêşkêşî sekreteriya giştî ya NY’yê dikin bergiriyeke fermî û pîşeyî ye û ne rewa ye û nakeve bin itîrafa NY’yê. Çavkaniyan ji rojnameya Cathimerinî ya Yewnanistanê re piştrast kir ku muzakereya Tirkiye-Lîbyayê ne qanûnî ye û binketî ye. ***ATÎNA***



## Qirkerekî din jî dê bê darizandin

Êrîşên qirkirinê yên sala 1994'an ku nêzî 800 hezar tûtsî lê hatin kuştin, piştî ku Artêşa Welatparêzên Rûandayê ya bi lîderiya serokdewletê heyî Paûl Kagame hikûmeta Hûtû hilweşand, hatibû rawestandin. Felicien Kabuga yek ji wan kesan e ku di qirikrina 800 hezar tûtsî yên li Rûandayê de cih girtiye.
Felicien Kabuga ku meha gulanê li paytexta Fransa Parîsê hate girtin, yek ji damezrînerên koma milîs a ji gelê Hûtû Înterahamwe ye ku di qirkirina 1994'an de rola xwe hebû. Kabuga di heman demê de bi 'fînansoriya' qirkirinê dihate sûcdarkirin.
Ji bo Kabuga li Dadgeha Navneteweyî ya Rûandayê bê darizandin ku Neteweyên Yekbûyî li Tanzanyayê dabû destpêkirin, serlêdana radestkirina Kabuga hate kirin. Dadgeha Bilind a Fransayê jî biryar da ku ji bo radestkirin û darizandina Kabuga tu astengî nîne. Dê piştî vê biryarê Kabuga ku bû sedema qirkirina sed hezaran tûtsiyan bê darizandin.
***PARÎS***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Şerê Qerebaxê çawa dest pê kir?

Herêma Qerebaxê çima girîng e, pirsgirêka di navbera Ermenistan û Azerbaybanê de çi ye û çawa dest pê kiriye?

Pirsgirêka herêma Qerebaxê ji destpêka sadsala 20'an û vir ve di rojevê de ye. Ev pirsgirêka heyî, ji serdama Sovyetê heya niha nehatiye çareserkirin. Herêma ku 4 hezar û 400 kîlometre çargoşe ye di nevbera Ermenistan û Azerbaycanê de ye.

Ermenistan û Azerbaycan, di sala 1922'an de beşdarî Yekîtiya Komarên Sosyalîst a Sovyetê bûn. Bi tevlêbûna her du welatan ve, ev herêma ku di navbera her du welatan de her tim pirsgirêk bû di sala 1923'yan de bi statuya komara xweser bi komara Azerbaycanê ve hat girêdan. Ev biryara Moskovê tu carî ji hêla rêveberiya Erîvanê ve nehat qebûlkirin.

Di salên 1980'yan de serdama ku Komarên Sovyetê ber bi hilweşandinê ve diçûn, pirsgirêka Qerebaxê jî dîsa ket rojevê.

Ermeniyên li Qerebaxê birêxistinkirî, êdî bandora Moskovê li ser xwe mîna berê hîs nedikirin û îdia dikirin ku; "Di serdema avabûna Sovyetê de ji bo ber dilê Tirkiyeyê xweş bikini, Qerebax bi Azerbaycanê ve hat girêdan." Di cotmeha sala 1987'an de li Erîvanê çalakiyên piştgiriya vê daxwazê hatin lidarxistin. Piştî çalakiyan bi çend roja, di 18'ê cotmeha 1987'an de li ser xeta sînor pevçûna yekem rû da. Ermeniyên li gundê Çardakli yê li herêma Qerebaxê, bi daxwaza ji bin rêveberiya azeriyan derkevin êrîş dibin ser xelkê azerî.

Bi bûyerên li gundê Çardakliyê qewimîn ve, ermenên li Azerbaycanê û azeriyên li Ermenistanê koçî welatê xwe kirin.

Di sibata 1988'an de, wekîlên ermen ên konseya Qerebaxê bi hinceta rêjeya nufûsa Qerebaxê ji sedî 70'yê ermen in, xwestin ku Qerebax bi Ermenistanê ve were girêdan. Rêveberiya Bakuyê û Moskovê ev daxwaz qebûl nekirin.

Li hemberî vê biryara Moskovê Levon Ter-Petrosyan ê wek lîderê Tevgera Neteweyî ya Ermenan hatî hilbijartin, piştî ku Ermenistan ji Yekîtiya Sovyetê qetiya û şûn ve, bû yekemîn serokomarê Ermenistanê.

Azerbaycan jî di heman salê de serxwebûna xwe ragihand. Di wê demê de ji ber wendahiyên li herêma Qerebaxê, rêvebirî ji kar hat girtin. Di sala 1993'yan de Haydar Aliyev bû serokomarê nû yê Azerbaycanê.

Di sala 1991'î de, dema pevçûn ji nû ve dest pê kirin, Moskova piştgiriya xwe ji bo Bakuyê ragihand. Di meha gulanê de artêşa Sovyetê bi yekîneyên azerî re derbasî herêma Qerebaxê cihê ermenen lê dijîn bû.

Piştî Azarbaycanê serxwebûna xwe ragihand û şûn de, di sala 1991'î de xweseriya herêma Qerebaxê jî hat bidawîkirin.

Piştî mehekê, di 10'ê kanûna 1991'î de meclisa herêma Qerebaxê bi referandûmekê xwest ku ji Azerbayanê qut bibe. Piştî referandûmê azeriyên rêjaya nufûsa wan ji sedî 20 e, çalakiyên boykotkirina referandûmê li dar xist. Meclisa Qerebaxê di sala 1992'yan de, serxwebûna xwe ragihand, lê ji bilî Ermenistanê kesî serxwebûna Qerebaxê nas nekir.

Li gor çavdêriya Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan di sala 1992'yan de li gundê Hocali ji hêla çakdarên ermen ve herî kêm 162 azerî hatin kuştin.

Çekdarên ermen ên li herêma Qerebaxê, xwe bi rêxistin kiribûn. Korîdora Laçîn a navçeya Suça û Ermenistanê bi hev ve girêdide xistin destê xwe.

Di şerê ku 1994'an de bi dawî bû, herî kêm 30 hezar kesan jiyana xwe ji dest da. Herêma Qerebaxê 7 herêmên din jî hêla Ermenistanê ve hat bidestxistin. Azeriyên li herêmê bûn jî, ketin rewşa penaberan.

Di gulana sala 1994'an de protokola Bişkekê hat îmzekirin û agirbest hat ragihandin.

Di sala 1993'yan de, piştî Haydar Aliyev hat ser erkê û şûn de, li Azerbaycanê şerê navxweyî nesekinî. Ji ber vê yekê ermenan xwe li herêmên bi dest xistibûn xurt kirin. Di vê demê de budçeya Ermenistanê û Qerebaxê bû yek.

Di sala 1994'an de ji bo çareserkirina pirsgirêkê, di pêşengiya Teşkîlata Hevkarî û Ewlehiyê ya Ewropayê koma Mînskê hat avakirin. Koma ku Rûsya, Fransa û Amarîka serokatiya wê dikin, Almanya, Îtalya, Belarûs, Swêd û Fînlandiya jî bûn endam. Di encama xebata deh salan de, teşkîlatê di 27'ê mijdara sala 2007'an de bi qebûlkirina her du welatan planek aşkera kirin.

Li gor Prensîbên Madrîdê tên binavkirin, wê rêyên li derdora herêma Qerebaxê radestî Azerbaycanê bên kirin; ji bo encamek bingehîn wê dest bi hevdîtinan bihata kirin; korîdora di navbera Ermenistan û Qerebaxê de bihata vekirin; kesên hatine koçkirin vegerin ser axa xwe û ji hêla teşkîlatê ve hêzên aştiyê li herêmê bên bicihkirin, lê ji 2007'an û vir ve car bi car li herêmê şer berdewam kir.

Carna li çareseriya pirsgirêkê rayedarên her du welatan li hev civiyan, lê haya niha tu encameke erênî ji van hevdîtinan derneketiye.

Li herêmê, di hezîrana 2010 û 2012'an, sibata 2012'an û 2015'an û nîsana 2016'an de pêvçûnên pir dijwar rû dan.

Ermenistan piştî belavbûna Sovyetê serxwebûna xwe bi dest xistibe jî, di warê diplomatîk, leşkerî û aborî de her tim girêdayî Rûsya bû.

Moskovê heya hilweşîna Sovyetê, her tim hewil dida ku herêma Qerebaxê wek herêmek xweser bi ser Azerbaycanê ve be. Rûsya ji bo aştiya herêmê dixwest ku leşkerên xwe wek hêzên aştiyê li herêmê bi cih bike. Her çiqas Moskovê dixwest jî, rêveberiya Erîvan û Bakuyê li dijî vê planê bûn.

Tê zanîn ku ji belavbûna Sovyetê û vir ve, Ermenistan hemû çekên giran ji Rûsyayê distîne, lê Rûsya her çiqas alîgiriya xwe bi awayekî aşkere nekiribe jî, her tim ji bo her du welatan bangewaziya diyalogê dike.

Di 2'yê nîsana 2016'an de, li eniyê di navbera artêşa her du welatan de ji nû ve pevçûn dest pê kir. Di vê pevçûnê de ji her du aliyan kesên sivîl jî di nav de, gelek kesan jiyana xwe ji dest da. 5'ê nîsanê Azerbaycanê piştre Ermenistanê agirbest ragihand.

Di vê demê de jî, Rûsya li şûna bi awayekî aşkera alikariyê bide Ermenistanê, banga diyalogê kir, lê dewleta tirk bi awayekî aşkere piştgiriya xwe ji bo Azerbaycanê destnîşan kir. Ev yek jî, ji hêla Erîvanê ve hat rexnekirin. Serokomarê wê demê yê Ermenistanê Serj Serkisyan got; "Pêwîst e dewleta tirk dûrî pêvajoya çareseriya Qerebaxê bisekine. Di vê pêvajoyê de ku hêzên navneteweyî li ser bikaranîna hêzên li herêma Qerebaxê nîqaş dikin, piştgiriya dewleta tirk a ji bo Azerbaycanê ne di cih de ye."

Ji bo agirbest teqez bibe, di 16'ê gulana 2016'an de di navbera serokomarê Azerbayanê Îlham Aliyev û serokomarê Ermenistanê Serj Sarkîsyan de, bi çavdêriya Amerîka, Rûsya û Firansayê de, li Viyanayê hevdîtinek hat kirin.

Di meha hezîranê de serokdewletê Rûsyayê Vlademîr Pûtin, bi Îlham Aliyev û Serj Sarkîsyan re li bajarê St.Petersbûrgê civiya. Piştî civînê rayedarên azerî ragihandin ku wê artêşa Ermenistanê ji hin herêmên Qerebaxê vekişe; li hin herêman jî ji bo vekirina rêya bejahî wê hêzên Ermenistanê bimînin; piştî wê jî di navbera aliyan de wê hevdîtin berdewam bikin, lê aliyên ermen ev daxûyaniya azeriyan derawand û ev hevdîtin jî bêencam bi dawî bûn.

Dema Ermenistanê serxwebûna xwe ragihand, dewleta yekemîn a wê qebûl kir dewleta tirk bû, lê di 1993'yan de dema Ermenistan ket herêma Qerebaxê dewleta tirk xwe da aliyê Azerbaycanê; sînorê xwe yê bi Ermenistanê ve girt û dawî li xebatên xwe yê diplomatîk anî.

Di meha tîrmahê de li herêma Tovûzê ya qet lê pevçûn neqewimîbûn, di navbera hêzên ermen û azerî de bi çekên giran pevçûn deket.

Der barê vê êrîşê de, ji aliyên gelek pisporan ve nerînên cuda derketin holê. Dihat gotin ku; ji ber rêvebiriya Baku û Erîvanê pêvajoya vîrûsa koronayê baş nikarîbûn bi rê ve bibin û di vê mijarê de gelek rexne li wan tên girtin; di nav gel de bêkarî û xizanî zêde bûye. Bi van çalakiyan dixwazin bala civakê bikişînin ser mijarên cuda.

Li Rûsyayê jî hin pisporan şerê herêma Tovûzê wisa nirxand. Serokê nû yê Ermenistanê Nîkol Paşînyan bi vî şerî dixwaze otorîteya xwe xurt bike. Her wiha ji bo serokê Azerbaycanê jî dihat gotin ku; ji ber di nav gel de li hemberî rêvebiriya Îlham Aliyev nerehetiyên gel hene, ew dixwaze hêza xwe û otorîteya xwe nîşan bide.

Di vî şerê demkurt de, dewleta tirk bi awayekî aşkera piştgiriya xwe ji bo dewleta tirk ragihandibû. Şerê di 27'ê îlonê de ji nû ve har bû, dewleta tirk bi hemû hêza xwe ya ragihandin û dîplomatîk aşkere kir ku ew alîgirê azeriyan e.

Di vê mijarê de piştî pevçûna bi rojekê Erdogan derket pêşberî kamerayan û got; "Qerebax axa azeriyan e û pêwîst e dawî li vê dagirkeriyê were. Êdî dema hesapxwestinê hatiye."

Loma jî piştî van nirxandinên Erdogan nûçeyên ku "dewleta tirk ji herêmên cuda ji bo li dijî ermenan şer bikin çeteyan dişîne eniya şer" zêde bi mirov eceb nayên.

Gelo ev şer wê ji pirsgirêka heyî re bibe çareserî an jî wê pirsgirêkê hîn kurtir bike? Li gor kronolojiya heyî diyar e ku şer ji pirsgirêka heyî re nabe çareserî. Wisa diyar e ku hin alî ji vî şerî gelek tiştan hêvî dikin. Bi demê re wê niyeta wan a rast derkeve holê.

# Li Kurdistana Sor şerê ermen û azeriyan

Di 27'ê îlonê de li herêma Qerebax ku di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de ye, şer dest pê kir û dewam dike. Cihê niha şer lê diqewime herêma Kurdistana Sor e; lê di nûçe û agahiyan de ne navê kurdan heye û ne jî navê erdnîgariya ku 100 sal berê Kurdistana Sor lê hatibû avakirin.

Dewleta tirk azeriyan sor dike û şer gur dibe. Derket holê ku Tirkiyeyê gelek çete şandine herêma Kurdistana Sor û Ermenistanê jî ragihand ku balafira wan ji aliyê balafirên şer ên Tirkiyeyê ve hatiye xistin. Ger mirov li daxuyaniyên rayedarên Tirkiyeyê binere, agahiyên tên belavkirin piştrast dibin. Berdevkên hikûmeta tirk misêwa piştgiriya xwe ya ji bo Azerbaycanê tînin ziman û Ermenistanê dikin hedef.

Hem li welat û hem jî li derveyî welat, polîtîkayên şer ên hikûmeta AKP'ê dewam dikin, lê di esasê xwe de şerê li welat û derveyî welat tê meşandin li hemberî kurdan e. Li Başûr, Sûriye, bakurê Kurdistanê kurd û deskeftiyên kurdan hedef tên girtin. Şerê niha hatiye destpêkirin jî balkêş e ku li herêma kurdan diqewime, lê du hêzên din li vir şer dikin. Dewleta tirk di demên dawîn de li Lîbya, Idlib, deryaya Spî têk çû û dixwaze vê carê jî xwe li Qafqasyayê xwe biceribîne. Tê gotin ku armanca dewleta tirk ew e ku li herêma Kurdistana Sor baregehên leşkerî ava bike.

Li Ermenistanê gelek baregehên leşkerî yên Rûsyayê hene û li gorî Rêxistina Peymana Ewlehiya Kolektîf li herêmê Ermenistanê diparêzin. Di vê çarçoveyê de beriya şer piştgiriya çek û leşkerî jî da Ermenistanê. Ger mirov têkiliyên Rûsya û Azerbaycanê jî li ber çavan bigire hebûna vî şerî bi kêrî polîtîkayên Rûsyayê tê û wek firsendekê tê dîtin.

Li gorî daxuyaniyên rayedarên Ermenistan û Azerbaycanê heta niha bi hezaran leşker hatine kuştin; bi hezaran malbat koçber bûne. Her çiqas şer di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de xuya bike jî, tiliya gelek dewletan di vî şerî de heye; di serî de DYA-Rûsya-Tirkiye, van dewletan ji bo berjewendiyên xwe her du dewletan didin şerkirin.




## Kurdistana Sor

Kurdistana Sor di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de ye. Kurdistana Sor di sala 1923'yan de hatiye avakirin û ji 6 bajarokan pêk tê. Destpêkê navend gundê Pîrîcahanê bû û piştre navend bûye Laçîn. Li gorî serjimêra sala 1926'an nifûsa Kurdistana Sor zêdetirî 51 hezarî ye. Ji sedî 73 kurd, ji sedî 26 azerî û yên din jî ermen in. Piraniya kurdan asîmîle bûne. Ji ber zextan gelek malbat koçber bûne û yên mayî jî asîmîle bûne. Piştî ku rêveberiya Sovyetê diguhere di sala 1929'an de Kurdistana Sor tê hilweşandin.

# Xopawitiş û destbendkerdişî



Semra Turan



Ganî cinîyî xopawitişê meşru bigêrê rojeva xo. Tena aşma êlule de 36 cinîyî ameyî qetilkerdene. Cinîyê ke wazenê vera qetlîyam û destbendkerdişan de bivejîyî, yenê destbendkerdene û tepiştene

Çiqas şono dinya û Tirkîye de zilm û zordarîya ke serê cinîyan de yeno rayraberdene hîna zêde beno. Her çiqas ke cinî verva no zilm û zordarîye de çalakîyanê xo bidomnî zî nêeşkenê vernîya nê polîtîkayan bigêrî. Aqilê camêrd û dewlete dest danê yewbînan ro û polîtîkayanê ke cinîyan qir kenê, pîya domnenê. Hemverê nê polîtîkayan de ganî cinî se bikera? Gelo çi bêro kerdene, vernîya nê polîtîkayan do bêro girewtene.

Qet şik çino ke ganî heme çî ra ver cinîyî xopawitişê meşru bigêrê vernîya xo û bikerê rojeva xo ya yewine. Ganî cinî her ca de qala xopawitişê meşru bikerê. Ganî cinî her cayê dinya de xopawitişê meşru bişixulna û xo rêxistin bikera. Çimkî zilm û zordarîyê ke serê cinîyan de yenê rayraberdene, tena bi xopawitişê meşru eşkenê çin benî.

Xopawitişê meşru hetê komel û zaf kesan ra sey hêz yeno vînayene. Eno kêmanîyêko zaf pîl û şaş o. Çimkî xopawitişê cinîyan hêzê fîzîkî ra wetêr, zihnîyetê xo de xorêxistinkerdiş o. Vernîya her tewir şîdetî de vindertiş o. Cinî bi xopawitişê meşru eşkena her ca de fikrê xo azad bîyara ziwan. Cinîya ke zihnîyetê xo de xopawitişê meşru pê bîyara, eşkena bi hawayêko xurte vernîya zilm û zordarîya camêrdan de û vernîya nê polîtîkayan de pît vindera. Yanî ganî xopawitişê meşru sere de zihnîyet de bêro qebulkerdene. Cinî biwaza bi xopawiş û fikrêko azade, eşkena her ca de bedilnayîşan vîraza. Çîyo lazim oyo ke ganî cinî bi eno fikirî her ca de bêrê yew ca…

**Lazimo çi bêro kerdene?**

Polîtîkayê qirkedişê serê cinîyan hetê hereketê cinîyan ra senî yenê vînayene, se kenê û lazimo çi bêro kerdene? Perskerdişê enê persan helbet muhîm ê. Çimkî polîtîkayê ke serê cinîyan de yenê rayraberdene zelal ê. Ez wazena polîtîkayê ke yenê waştene ke serê cinîyan de bêrê rayraberdene nê, mesajê cinîyan çi yo bizana û înan rê pers bikera. Ganî her çî ra ver mesajê cinîyan çi yo bêro vatene û se kenê bêro perskerdene. Çimkî ma tarîxî ra zanê ke aqilê camêrdan cinîya azade nêwazeno. Wazenê cinî bindest biba. Nê polîtîkayan vera hûmara cinîyê ke sere wedarnayî zaf a. Ez nêwazena aqilê camêrdan û polîtîkayanê înan sero vindera. Ez wazena mesajê verê qirkerdişî çi yo bizana. Pers bikera û polîtîkayanê cinîyan sero nuşteyan binusna…

Ma eşkenê derheqê hereketê cinîyan ê Tirkîya û hereketê cinîyan ê kurdan de vajê ke her roje semedê nê polîtîkayan çalakîyan viraştî û virazenê. Ancax verva nê polîtîkayanê qirkerdişî de çalakîyê cinîyan kêm manenê. Hereketê cinîyan ê Tirkîya xopawitişê meşru ra zaf eno çend aşmanê peyênan de rojeva ke îqtîdar eşto werte (Pêkerdişê Stenbolî) sero de vindenê û çalakîyanê xo serê na rojeve de virazenê. Pêkerdişê Stenbolî semedê pêroyê cinîyan muhîm o, ancax no pêkerdiş xora aktîf nîyo. Yanî dewleta Tirkîye tena îmza eşta pêkerdişî. Heta ewro tu çîyo ke no pêkerdiş de nuseno, nêarda ca. No pêkerdiş semedê ma cinîyan muhîm o, la pêkerdişo ke dewre de çin bo, manaya ci zî çin o. Coka ra ganî hereketê cinîyan ê Tirkîya bi lez rojeva ke îqtîdar veto werte ra bivejîyo û semedê azadî û rêxistinbîyayîşê cinîyan rojevêka newe bikero vernîya xo.

**Tirkîye de destbendkerdişî**

Kişta nê çîyê ke yenê cuyayene de heto bîn de Tirkîye de tena aşma êlule de 36 cinîyî hetê camêrdan ra ameyî qetilkerdene. Înan ra 16ê ci ameyî qetilkerdene û 20ê ci zî mergê şikin bî. Verva qetilkerdişê cinîyan û şîdetî de tena çare xopawitişê meşru hemverê ma de vindeno. Sekreterê Pêroyî ê Neteweyanê Yewbîyayeyan (NY) Antonio Guterres qiseykerdişê xo ê 4. Konferansê Cinîyan ê Dinya de bale ant qetilkerdişê cinîyan ser o û va 'Ma eşkenê vajî ke tay cayanê dinya de hûmara cinîyê ke yenê qetilkerdene manena şerêk'. No qiseykerdiş daxî nîşan dano ke temsîlkarê zihnîyetê serdestî yanî ê îqtîdarî hemverê cinîyan de şer dayî dest pêkerdene. Rewşa Tirkîye zî înan ra zaf cîya nîya. Cinîyê ke wazenê hemverê qetlîyam û destbendkerdişan de bivejîyî raşteyan, yenê destbendkerdene û tepiştene. Bi no hawa zî hewl dîyeno ke cinî bêra bêvengkerdene. Cinî eşkena bi xopawitişê meşru xo bipawa û hemverê şerî de payser de vindera. Cinî do pê xopawitişê meşru qezencanê girdan bigêra dest.

**Hereketê cinîyan se keno?**

Hereketê cinîyan ê kurdan hetê rojeva xo de kêmî manenê. Herême de zilmê serê cinîyan zêde yo. Polîtîkayê dewlete ewil serê cinîyan ê kurdan de yenê rayraberdene û mesajanê xo zî serê cinîyan ê kurdan de danê. Raştîyêko wina esto. Hereketê cinîyan ê kurdan timî bi rêxistinbîyayîşê xo hîna lez cewab danê polîtîkayanê îqtîdarî. Hereketê cinîyan ê kurdan çend hewte verê startê kampanyaya "Ma xo pawene" da. Semedê pêroyê cinîyan na kampanya zaf muhîm a. Ganî her cinî cade embazanê xo tewrê na kampanyaye bikera. Çimkî na kampanyaya xopawitişî ya. Na kampanya vana ke wa cinî xo bipawa û xopawitişê meşru biyara ca.

Ganî ma semedê rêxistinbîyayîş û azadîye her ca de xopawitişê meşru pê bîyarê…

# Dapîr û bapîrê ma merdî, êdî kam zazakî qisê keno?



Mahîr Uzmez

Goreyê agahîyê Unescoyî ke girêdayeyê Neteweyanê Yewbîyayeyan a, dinya de 6 hanzar ziwanan ra 2 hanzar û 473 ziwanî binê tahlukeya vinîbiyayîşî de yî. Bi yewna watişê reydi; her di hefte de di yew ziwan vinî benê.


Kurdistan de zî ziwanê ma, zaravayê zazakî binê tahlukeya vinîbiyayîşî de yo.

Unesco, goreyê qisêkerdina ziwanan, kategorîya tahlukeya vinîbiyayîşê ziwanî zî veto werte. Goreyê kategorîya Unesco zazakî tena hetê îxtîyaran ra yeno qiseykerdene, labelê hetê no doman û ciwanan ra nîno qiseykerdene, yan zî ciwan û domanê zazayan ziwanê xo qet nêzanî.

Zazakî, Bakurê Kurdistanî de yanî herêmanê sey Amed, Çewlîg, Elazîz, Dêrsim, Erzîngan, Sêwas, Erzirom, Meletî, Semsur, Bedlîs, Elîh, Gumuşhane, Kayserî û Aksarayî de yeno qiseykerdene. Goreyê tahmînan Bakurê Kurdistan, Tirkîya û Ewropa de 4 ra heya 6 mîlyon merdimî eno ziwanî qisey kenî. Zazakî bi eno cografyaya hîray û hetê hende zaf merdiman ra yeno qiseykerdene labele rayna zî binê tahlukeya vinîbiyayîşî de yo.

Sebebê eno tabloya ke vecîyaya werte, suc tena qiseynêkerdişê domanan û ciwanan nîyo helbet. Serê zazakî û heme ziwananê bînî yê welatê ma de asîmîlasyon û qetlîyam esto û ziwan hetê dagirkeran ra ameyê asîmîlekerdene. Coka ra sebebo tewr pîl dagirkerî yî.

Dagirkerî çendî zî serê ziwan û kulturê ma de asîmîlasyon virazê zî, ma zî bêsuc nîyê. Ewro ma dekoytî yew şaşîtîya pîl mîyan. Êdî ma vînenê ke dewan de zî zazakî nîno qiseykerdene. jenerasyono newe fek qiseykerdişê ziwanî ra verdêne, ziwanê xo zî nêzanê. Ewro êdî şiwanê ma û berîvanê ma zî fek ziwanê xo ra vera dayî û dest bi qiseykerdişê ziwanê tirkî kerdê. Coka ez rayna wana ke vinîbîyayîşê ziwanê ma tena sucê dagirkeran nîyo.



Heta enka dapîr û bokalê ma eno ziwan qiseykerdê. Ge-ge bibo zî ma eno ziwan eşnawenî û qisey kenî. Êdî wextê înan zî temam beno ê koçê dinyaya bîne kenê.

Eke ê zî koçê dinyaya bîn bikerê, ma do se bikerê!

Enê rojan de hema hema heme sazîyê Kurdan verva êrîşanê dewlata dagirkere de qerarê tekoşînî danê û dest bi hemleyan kenê. Ez zî vana, ma zazayî verva asîmîlekerdişan de qey semedê ziwanê xo yew hemleya wayirvejîyayîşî dest pênêkenê?

Temam dewlete dagirker a û xemê ci nîyo ke zazakî merdo yan zî vinî bîyo. Dewlete dagirker a, labele ma zazayê çi yê?

Eke zazakî nêbo derdê zazayan, nêbeno derdê yew kesî zî. Bêrê ma heme yew qerar bigêrî, heta ke Bapîrê ma hema estê ma înan ra ziwanê xo bonder bibê û ma yewbînan reyde zazakî qisey bikerê û domananê xo bonder bikerê...

## Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

# Îstîfa

Îstîfa çekuyê ke bi erebî ya. Maneya xo, jo xo bi xo dest kar ra verado. Di serdemê modernî de, bi taybetî welatanê modernan de îstîfa zehf yena xebetnayîşî, welatê tepiya mendê yê zey Tirkîya, Rojhilato Mîyanîn de îstîfa zêde çinî ya. Meseleya ma ya ewroy îstîfa wa.

**Fûtbol de îstîfa**

Me mîyanê cihane de fûtbolî de zehf rastê îstîfayan yenê. Di tîmanê fûtbolî yê welatanê dinya de bi taybetî teknîk direktorî wexto ke bi ser nêkunê îstîfa kenê. Welatanê Ewropa de eno awa îstîfa esta, la en zehf zî Tirkîya de wa. Tirkîya de her serêkey futbolî de, tenê Lîgo Super de belkî des teknîk direktorî îstîfa kenê û ca bedelnenê.

**Îngilistan de îstîfa**

Welatê Ewropa de heme anayê, eke weçînayîş de partîyê înan ser nêkewa, serekê partîyan îstîfa kenê. Ê îstîfa zî zey rûmetî vînenê. Xala balkêşe Îngilistan de wa. Îngilistan de Partî Mihafezekar û Partîya Karkeran (PK), di partî her welat reyra benê. Di serey 1997'inan de Tony Blair zey Serokê Partîya Karkeran bî Serokwezîrê Îngilistanî. Blair 10 serrî serokwezîrî xo dewam kerd û 2007'inan de kursî xo teslîmê Gordon Brownî kerd. Brown wexto di serey 2010'inan de di weçînayîş de bi ser nêkewt îstîfa kerd. A çaxî ra nat PK nêbiya îqditar. Ed Miliband hame cay Brownî, la 2015'inan de nêşka weçîyanîş de bêro iqtîdar û ê zî îstîfa kerd. Jeremy Bernard Corbyn hame cay cê û bî serekê PK'î, heta 2020'inan ê zî nêşka PK'î bikero îqtîdar û îstîfa kerd. Emsar Keir stamer bîyo Serekê Partîya Karkeran.

**Tirkîya de îstîfa**

Îngilistan de mesela ana wa la Tirkîya de away bina. CHP xo zey partî çep û karkeran mocneno ra. Kemal Kiliçdaroglu di 22'yê gulama 2010'î de hame cay Deniz Baykalî. Referandûmî zî têde nizdê des weçînayîşan de Kiliçdaroglu têk şî, nêşka partî xo bikero îqtîdar la reyna zî serê karê xo de wo û îstîfa nekeno.

**Îstîfayê Bîlgenî**

Ma çi rê serê ene mesela de vindertî? Semedê Hemşaredarê Qersî Ayhan Bilgenî. Bilgen merdimêke zanawo. Roja 25'ê Êlûna 2020'inan Şaredar Bilgen û dewrê 20 rêveberê verî û enkay ê HDP'î hamey tepişnayîşî. Dimay heftey ke Bîlgenî bi parêzeranê xo dir xebere şirawite teber; "Egir ez bêrî girotişî ez o hepis de kitabê xo yê 3'inan binisnî. Ger bêrî veredayîşî û heta a çaxî hema kayûm nêşirawitbo serê Şaredarî Qersî, ez o şaredarî ra îstîfa bikerî û ez o karê koperatîfî dewam bikera ke eno kar zî qasê karê şaredarîye muhîm o. Heme partî têdir eşkenê pirekêke weçînê, Qers ene joy heq keno." Dewlete ke waştêne qayûm bişrawa serê şaredarî ene xeberey îstîfa ser tepişnayîşê înan dewam kerd û roja bîn Hemşaredara Qersî Şevin Alacaye zî mîyan de Encumenê Meclisey Qersî yê HDP'î û rêveberê bînî yê HDP'î zî girotî bin çiman. La îstîfayê Bîlgenî zey hemleyêk muhîm veng da. Ri dewlete baştir mocna dinya. Helbet rojo ene nişte hamî niştişî Bîlgen û rêveberê bînî hamey girotişî û ê şirawitî hepis, belkî qayûm zî bişrawê Qers la hemley îstîfa hemleyêk muhîm bî.

Heta Tirkîya û welatê tepîya mendê de meselay "îstifayan" baş nêro famkerdişî, heta merdimî bi desan serran serê enû kursî de rûşê ê welatî nêbenê demokratîk û raver nêşînê.



Kewê Redkan

# Mêvantî


Li cem me qedrê mêvantiyê ji her tiştî zêdetir tê girtin; em ji bav û kalên xwe hîn bûne ku qedrê mêvanan baş bizanin. Ger mêvanek ji hurmeta me razî nebe, em xwe poşîde dihesibînin; lewma gava mêvanek tê ber derê me ezet û hurmeta herî mezin em ji wan re dikin; em dixwazin ku ew ji mêvantiya mala me razî be, bi kêfxweşî vegere mala xwe. Ew xwarin û vexwarinên di mal de veşartî, hemû jî sewa mêvanan bûn, dê û min bavê min digot; "Evana ji bona mêvanên ku ji nişkê ve hatin malê, bila kesek destê xwe dirêjî wan tiştên veşartî neke." Ez carna difikirîm, gelo çima hemû xwarin, cil û berg sewa mêvanan dihatin veşartin? Çima ne ji bo me, em xwediyê malê ne, bila ji bo me ew tiştana bêne veşartin; mêvan tên û di nav çend rojan de derbas dibin û diçin, ew keda me ye, filan û bêvan û heta ku ez hinekî mezin bûm min fêm kir ku mêvantî ji bo me xwedî nirxekî çawa ye. Ew mala ku mêvan jê kêm nabin, mala herî dewlemend e, mala herî bereket jê kêm nabe.

Îca piştî salan ez mezin bûm û çûm bajarekî din; li wir min ji xwe re çend hevalên biqedr û zana peyda kirin. Her dem em li cem hev, guhê me li ser hev bûn. Di hebûn û tunebûnê de em digihîştin hawara hevûdu. Mêvan di nav me de jî wek xwediyê malê bû, lê di nav van hevalên min de hevaleke min zêdetir kêfa min jê re dihat. Bi xweşikbûna wê, kurdewariya wê, zimanê wê û pêşwazîkirina wê ya mêvanan devê min vekirî dima. Wisa kêfa min jê re dihat, hê jî kêfa min jê re tê... Dîsa rojekê ez û çend hevalên xwe yên din, em li ba hevûdu civiyan; xwarin û vexwarin, vir de û wê de, me kêfeke bi dilê xwe kir; dû re hemû kes belav bûn û çûn ser karên xwe û malen xwe.

Ew hevala min a din, navê wê Henda ye, esasî navê wê yê rastî Handan e, em jê re dibêjin Henda, ev nav kêfa wê jî jê re tê. Henda hat ber derê min, min derî jê re vekir, kerem ke were malê. Got; "Na, ez nayêm mala te, ez nan û ava te jî naxwim, wana ji bo hevalên xwe veşêre, hewce nake ez bêm mala te û tu jî min re hurmetê bikî. Waye tu diçî cem hevalên xwe dicivî; dema xwe bi wan re derbas dikî; kêf û henekan dikin, lê qet ewqas dema te ji min re tune ye. Dema ez dibêjim were cem min, tu her demê bêfila xwe bilind dikî û bi serê zimanê xwe bersiva min didî; min ewqasî ji te re qedir û hurmet kir, tu çend caran hatî mala min, min tu bi nan û av kir; tu di mala min de razayî, dema pêdiviya te çêdibe tu berê xwe didî mala min" û got û hey got, derî lêxist û çû.

Ez li ber derî matmayî mam. Min heta vî emrê xwe gotinên wisa nebihîstibûn, ev çi gotin in! Ez pir êşiyam. Dema meriv dibe mêvan, meriv nabe deyndarê hev, êşiyam pir êşiyam... Dû re ez çûm ber derê wê, min li derî xist, bi rûyekî hêrs derî vekir, min got; "Min tiştek ji gotinên te û hêrsa te fêm nekir, lê bi van gotinên te ez êşiyam, heta demekê em hevûdu nebînin baştir e, kengê dilê te rehet bû wê demê gazî min bike em xeberdin."

Got; "Na dayê, ne ez, tu naxwazî min bibînî!" Dîsa got û got... Min cara dawî jê re got; "Tu hevala min î, ez tu carê dev ji te bernadim lê ji xwe re hinekî bifikire, dema te xwest û kêfa te hate cih gazî min bike" lê ew roj ev roj e, hê jî kêfa wê ne hatiye cih, dibe ku hevaltî û mêvandarî li cem wê ewqas jî pêwist nîne. Ez hê jî li benda wê me...




# Evdoyê Temîrcî


Çend rojan mêrik dereng ji kar hate malê û gelek caran bi şev jî derveder dima. Hevjîna wî aciz bû û got belayeke vî mêrikî heye. Rojekê telefona hevserê xwe kontrol kir û van sê navên di telefonê de bala wê kişand:

•Xwediya hembêza henûn
•Xwediya hêsra xweşik
•Şahînşaha xewnên min

Jinik pêşî li xwediya hembêza henûn geriya dît ku diya wî ye; paşê li xwediya hêsra xweşik geriya dît ku xuşka wî ye; dawî li şahînşaha xwenên min geriya dît ku telefona wê bixwe ye. Li ser vê yekê jinik gelekî li ber xwe ket ku çawa ji bo hevserê xwe wiha fikiriye. Ji bo ku xwe bide efûkirin meaşê xwe yê mehekê da hevserê xwe; xuşka wî gustîla destê xwe dayê û diya wî jî bazinê xwe da kurê xwe û got binêrin kurê min çiqasî mirovekî hêja ye. Piştî ewqas diyarî mêrik ew tiştên ku gihabûn ser hev tev firotin û ji yara xwe ya nû re diyariyek xweşik kirî. Navê wê jî di telefonê de hebû lê wî navê heskiriya xwe ya nû kiribû Evdoyê Temîrcî. Loma bala hevsera wî qet nekişandibû. Wey qeda bi bextê mêrên tolaz bikeve, ma pepûka xwedê ji ku zane, navê yara xwe kiriye Evdo.



# XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Bajarê bakurê Kurdistanê yê bi gola xwe navdar e 3. Roja em tê de ne.
5. Bawerî 6. Hunermendekî nemir, Gerebetê …..
7. Paytexta Sûriyeyê 9. Xwediyê kar 12. Bajarekî bakurê welêt
14. Cejin 15. Paytexta Ermenistanê
17. Noteke mûzîkê 18. Bersiva neyênî
22. Bi dizî guhdarîkirina gotinên hinekên din.

JI JOR BER BI JÊR

1. Ax, ox, of, weyla, waweylê
2. Seyd 3. Rojeke hefteyê
4. Erê, belê (bi îngilîzî bersiva erênî) 5. Hişyarî 7. Kesên ku ji parastin û azadiya welatê xwe bi çekan têdikoşin 8. Demeke salê, sîh roj 10. Arvan, genimê hêrandî
11. Cihê ku alifê sewalan dixinê
13. Di dawiya hemû diayan de tê gotin 14. Giraveke ku tê de girtîgeheke taybet heye
16. Hilberîna tiştekî nedîtî, pêkanîna karekî nû 19. Ji nişkan ve
20. Qul 21. Sewaleke kedî ku ji bo şîr û hiriya wan tê xwedîkirin
23. Cihê ku genim lê tê hêran

*Bersiva hefteya borî*




# Navên gundan ên rast li nexşeyê dinexişîne

Qedrî Esen

Li Tirkiyeyê navê bi deh hezaran gundan ên bi erebî, bûlgarî, ermenî, gurcî, kurdî, lazî, suryanî, yûnanî hatine guhertin û navên tirkî li wan hatine kirin. Di çarçoveya polîtîkayên tirkkirinê de guhertina navên gundan, piştî darbeya leşkerî ya Cemiyeta Îttîhat Terakkî, di sala 1913'an de dest pê kiriye. Bi avabûna komara Tirkiyeyê re ev polîtîka hatiye kûrkirin.

Li gorî daneyên fermî navê 12 hezar û 211 gundan hatine guhertin û tirkîkirin. Bi gundan re navê çem, gelî û çiyayan jî hatine guhertin. Bi giştî navê 28 hezar gund, çem, gelî û çiyayan hatine guhertin.

Bi guhertina navên cihên erdnîgariya wan re, piraniya gelên ku navên zimanê wan li jorê derbas dibin ji ser av û axa xwe hatine koçberkirin. Ji ber vê yekê li deverên din ên Tirkiyeyê, îro navên tirkî hatine qebûlkirin û navên berê hatine jibîrkirin. Hema bibêje kes navên wan ên berê nizane. Li bakurê Kurdistanê ji ber mayîna kurdan a li ser av û axa xwe rewş berovajiyê van deveran e. Navên berê yên gundan hê jî tên bikaranîn û ji bilî fermiyetê kes navên tirkî bi kar nayne, lê dewlet jî di navê fermî de israr dike û dixwaze navê tirkî bide qebûlkirin.



**Mordem Zel, navên gundên berê yên bakurê Kurdistanê berhev kirine û li nexşeyê nexşandine. Ne tenê gundan navên çem, çiya û deverên dîrokî jî berhev kirine**

**Di 2010'an de dest pê dike**

Li Amedê welatiyê bi navê Mordem Zel (45) ku li dewetan kilaman dibêje û bi vê re berhevkarî û lêkolîneriyê dike, ji bo mayîndekirina navên gundên berê yên bakurê Kurdistanê dest bi xebateke hêja kiriye. Zel, navên berê yên kurdî berhev dike û li nexşeyên navçe û bajaran bi cih dike. Em bi Mordem Zel re hatin ba hev û li ser xebata wî axivîn. Zel, di sala 2010'an de dest bi vê xebatê kiriye. Beriya ku dest pê bike, di sala 1994'an de koçî bajarên Tirkiyeyê dibe û ciwaniya wî li Stenbolê derbas dibe. Li vir nakeve bin bandora zimanê tirkî.

**Ewil gundê xwe meraq dike**

Zel, di sala 2007'an vedigere gundê xwe û bi van gotinan qala destpêkirina xebata xwe kir: "Hesreta axê û ziman; eşqa welat di dilê min de hebû. Destpêkê min navê gundê me kola. Min pirsa gelo ka navê gundê me ji kur tê ji xwe kir. (Qulî-Huseynîk: Arikli). Piştî navê gundê me navê gundên cîranê me ji min re bûn meraq."

Zel, piştî van meraq û daxwazan di dawiya sala 2010'an de navê kevn ên hemû gundên Licê berhev dike û piştre bi demê re navê kevn ên hemû navçeyên Amedê berhev dike.

Bi armanca ku ev xebat bi kêrî zarokên kurdan bê, Zel dest bi vê xebatê kiriye. Zel got ku wê li dibistanên azad ên kurdî hemû nexşeyên wî çêkirine bê daliqandin.

**Li qewê pirsî**

Zel, der barê rêbaza xebata xwe de diyar kir ku ji bo berhevkirina navê gundan ji înternetê sûd wergirtiye û ev tişt anî ziman: "Tişta herî girîng li cih lêkolînkirina navên gundan e. Min têkiliya xwe bi keyayan re danî û xwe gihand navê gundan. Li telefonê li wan geriyam û navê kevn ên gundê wan ji wan pirsî. Dîsa çûm navçeyên ku min navê gundê wan berhev kiriye. Li navendên navçeyan çûm qeweyan û navê kevn ên gundan ji gundiyên li qewê pirsî. Ji bilî navendên navçeyan çûm gelek gundan jî."


**Bajar bi bajar**

Zel navên gundan ne li gorî devoka gundiyan, li gorî rastnivîsê nivîsandiye û li bajarên mîna Amed, Çewlîg, Dêrsim, Mêrdîn, Êlih, Sêrt, Colemêrg, Wan, Bedlîs, Mûş, Riha, Xarpêt, Meletî, Mereş, Semsûr xebitiye û navê gundan ên berê berhev kirine. Li hin bajaran navên gundên, hemû navçeyan berhev kirine û li hin bajaran jî navê gundên hin navçeyan nivîsandine.

Bajarên ku navên gundên hemû navçeyên wan hatine berhevkirin; Amed, Çewlîg, Dêrsim, Mêrdîn, Êlih, Sêrt, Colemêrg. Bajarên ku navên gundên hinek navçeyên wan hatine berhevkirin; Wan (Westan, Elbak), Bedlîs (Xîzan, Tetwan), Mûş (Gimgim, Melazgir), Riha (Pirsûs, Cirnêreş, Wêranşar, Siwêreg), Xarpêt (Miyaran, Meden, Dep, Kovanciyan, Xox), Meletî (Şîro), Mereş (Pazarcix), Semsûr (Kolik) . Bajarên ku qet navên gundên wan nehatine berhevkirin; Agirî, Qers, Erzîngan, Îdir, Sêwaz, Dîlok, Şirnex, Erdexan, Erzerom.

Zel hemû navên gundên ku berhev kirine, li ser nexşeyê nexşandiye. Ne tenê navên gundan, navên çem, çiya û deverên dîrokî yên li gundan jî berhev kirine û bi gundan re li ser nexşeyê bi cih kirine. Piştî ku xebata xwe bi encam bike, difikire ku di demên pêş de weke ansîklopediyekê çap bike.

Weke hedef Zel, berhevkirina hemû navên gundên bakurê Kurdistanê daniye pêşiya xwe. Zel, gundên ku berê hebûne lê niha bûne kavil û vala ne jî dîtine û navên wan li nexşeyê bi cih kirine. Dîsa mezrayên ku nû ava bûne û navên wan di qeydan de tunene jî bi cih kirine.





# Ji bo kurdî girîngiya wergerê

Evîn Hesen

Her sal 30'yê îlonê wekî Roja Werger û Wergêran a Cîhanê tê pîrozkirin. Bêguman werger di pêşketina neteweyekê de xwedî cihekî girîng e. Gelek netewe berhemên cîhanê wergerî zimanê xwe dikin û kêm be jî hinek berhem wergerî kurdî hatine kirin.

Têkildarî mijarê li Qamişloyê mamosteyê Peymangeha Wergerê Welid Bekir ji rojnameya me re axivî. Bekir ji îngilîzî wergerî kurdî dike û bi bîr xist ku piştî şoreşa Rojava êdî zimanê kurdî derbasî hemû warên civakê bûye û wiha got: "Ne tenê zimanê wêje û hunerê, lê belê bû zimanê zanist, perwerde, sîstem û danûstandinê, lewre pîwîstî bi wergerê hebû ku bibe weke pireke nû û bi awayekî berfireh li Rojava cih bigire û bi taybetî ji zimanê erebî ber bi zimanê kurdî ve, ji ber ku pirtûkxaneya kurdî hîna lawaz e li gor pirtûkxaneyên zimanên din."

**Di rewşeke kambax de ye**

Mamoste Welid Bekir destnîşan kir ku li Rojava pisporên wergerê kêm in û wiha axivî: "Li her sazî û dezgehê ji ber pêwîstiyê, karê wergerê tê kirin, lê mixabin pisporên wergerê gelekî kêm in. Tenê hin kes weke tecrubeyeke kesayetî xwe fêrî hin rêbazan kirine û li gor wê dixebitin. Ango mirov dikare bêje ku wergera ku tê kirin di rewşeke kambax de ye, lewre werger weke materyal li beşa Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojava bi awayekî akademîk tê dayîn. Digel wê peymangeha Wergera Îngilîzî jî weke beşeke pispor jî hate vekirin."

Bekir Welid da zanîn ku pêdiviya civak û zimanê kurdî bi hemû berheman heye ku bên wergerandin û wiha pê de çû: "Di rewşa niha de ku zimanê kurdî bûye zimanê fermî li hemû deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê digel zimanê pêkhateyên din û her wiha bûye zimanê perwerdeyê ji refa yekemîn heta zanîngehê, ji ber vê divê bêhtir berhemên zanistî ji hemû beşên zanistê bên wergerandin. Ji bo ku xwendekarên astên bilind karibin lêkolîn û berhemên xwe di warên zanistî de pêşkêş bikin. Ji aliyekî din ve, pêwîstiyeke mezin bi wergerandin û her wiha nivîsandina berhemên zarokan jî heye."

**Nebûna ferhengên têgehan**

Bekir bal kişand ser rêbazên wergerê û ev tişt anî ziman: "Di pêvajoya karê wergerandinê de ku piştî şoreşa Rojava roj bi roj berfireh dibe, derket holê ku kêmasiyên herî berbiçav di têgehan de ye, ango heta niha pirsgirêka me nebûna ferhengên têgehan e. Ev yek dihêle ku her wergêrek li gor têgihîştina xwe têgeh û têgînan bi kar bîne, lewre gelek caran ev tişt derî li nakokiyan vedike. Kêmasiya din jî ew e ku wergêr carinan şêwaz û têgînên herêmî bi kar tîne ku dihêle zimanê kurdî hin caran ji reseniya xwe dûr bikeve. Kêmasiya herî zêde jî di warê wergerandina zanistî de derdikeve ango nebûna şêwaz û têgehên zanistî, ji ber ku cara yekemîn e zimanê kurdî (kurmancî) di warê zanistê de bi kar tê."

**Platformên dîjîtal lawaz in**

Bekir têkildarî platformên dîjîtal ên wergerê û Google Translate wiha axivî: "Bi rastî, bikaranîna Google Translate di warê zimanê kurdî de, gelek ziyanê dide karê wergerê, ev jî bi sedema ku gelek kêmasî û şaştî ji aliyê şêwaz, peyv û têgehan de hene. Bi gotineke din, ev yek mixabin di kurdî de nehatiye pêşxistin û hîna gelekî lawaz maye, lê hin ferhengine elektronîk vê dawiyê derketine, mirov dikare heta astekê sûdê jê werbigire. Careke din ez dibêjim pirsgirêka me ya sereke, nebûna ferhengan e. Divê bi awayekî lez, saziyên têkildarî zimanê kurdî li ser vê yekê bixebitin û berheman pêşkêş bikin."

**Nebûna saziya wergêran**

Mamoste Bekir got ku pêwîstî bi saziyeke wergêran heye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di mijara wergerê de hinek gavên berbiçav hatine avêtin û tecrubeyek çêbûye, lê ev tecrube têrê nake. Lewre, divê perwerdeyên akademîk li ser şêwazên wergerê bên dayîn û her wiha karê wergerê bên kontrolkirin. Bi gotineke din, pêwîstî bi saziyeke wergêran heye, ji bo ku bê naskirin ka kî dikare karê wergerê bike û kî nikare û ev yek ji aliyê vê saziyê ve bê diyarkirin. Ango divê wergêr di ezmûnekê re derbas bibe û li gorî wê ezmûnê belegeyek bê dayîn ji bo ku karibe bi awayekî fermî karê wergerê bike. Ne tenê ev, lê belê divê ev sazî di her dem û çaxê de endamên xwe li ser şêwazên nû perwerde bike."

xwebûn


5-11 Cotmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 42

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Sibîryaya welatê me: Serheda Jorîn[3]



Keştiya Alalû
**Agît Yazar**

...Bi mebesta em careke din jî werin Qersê, em gelek deverên dîrokî yên herêma Qersê dihêlin ji dem û demsaleke din re. Em dengê sewta Bozo, li gelî û kavilên bajarê Aniyê dihêlin û em xatirê xwe ji kavilên Aniyê, ji Bozo, ji Şahmaranê dixwazin û ji bajarê Aniyê vediqetin. Her em ji bajêr bi dûr diketin, dengê Bozo jî ji me bi dûr diket. Lêêê Şahmaraaaaan!..

Biharê, berika xwe ya kipîkesk li zozanê Serheda Jorîn bi comerdane raxistibû. Kurrên rût ên bêdar û ber, nola qadeke golfê ya bêser û ber bû. Kêzikên rengorengo yên bi rengê yaqûtî, zumrutî, lapîsî, lazûlî, kuvarsî û yên di rengên zêrînî de, ji kulîlkekê radibûn diçûn xwe li ser kulîlkeke din datanîn; ew kulîlkên ku wan kêzikên bi rengê xwe yê xweşik xwe li ser vedinişt. Hingê kulîlk di bin nigê wan de direqisîn û rengê wan kêzikan ên som, di bin tîrêjên rojê de diteyisî. Edetî xweza di bin tîrêjên rojê de, rabûbû govend û semaya rengîn, û cotçavên me, ji wan hezar û yek reng, hezar û yek kulîlkan re dibe cotek berbûyên nedawetkirî.

Her em ber bi Erdexanê ve dikudînin, dêm li me dizerpite. Gava meriv çav li wê xweza, av û hewayê dikeve, hingê meriv li ber dikeve ka çima qîzên vî welatî ew çend bedew û xortên wî ew çend tîtal in.

Em di nav vê cumuşa rengan de, bi xunaviyeke ji taviyên biharê û kemereke keskesora li nav ezmên, diçin heta Erdexanê, lê ji ber karantînaya koronayê, kela Erdexanê ji serdêran re girtî bû.

Her çiqas em diçin kela Xaltiyan a li navçeya Çildirê, lê em gera xwe ya esasî ji demsala zivistanê re hiltîne û di nigê nig de em berê xwe didin Îdirê.

Li Îdirê, li kêleka çemê Erezê bermahiyên Xaltî-Ûrartûyan hene û em berê xwe didin wê derê. Gava em xwe bera devê çemê Erezê didin, tabelayeke zengarokî ku li ser "gundê Surmelî" nivîsandîbû, derdikeve pêşberî me. Li ber malekê, riya erebeyan li wir bi dawî dibe. Pîrejinek li me radibe. Gurmikek porê wê yê hinekirî, di ber kofiya wê re pengizîbû der. Te yê bigota qey teyisandina fîşekên diranên wê yên zêr, bi porê wê yê sor î kur re ketiye qayîşkêşê. Pîrejin, bi zimanekî di navbera zimanê azerî û kurmancî de bi me re dipeyive. Navê wê Sefo ye. Kurdeke ji wî gundî ye. Çaxa em wê dera dîrokî ji dayika Sefoyê dipirsin, ew ji me re dibêje: "Lawo ew der di nav sînorê leşkeriyê de ye. Niha qamera li ser me ye. Û dibe werin pirsa we ji me bikin. Hingê, hûn jî bibêjin em mêvan in."

Gotinên dayika Sefo me ditirsînin; ne ji ber xwe, ji ber tirsa desteserkirina qeydên me yên berê. Em xatirê xwe ji dayika Sefo dixwazin û em di nigênig de, paş de difiskirînin. Rimilka ji ber tomofîlê radibe, di ser çemê Erezê re, bi tiralî ber bi Ermenistana wî aliyê çem ve bilind dibe; û gotina dayika Sefo ya "dewekî cemidî vexwin û paşê biçin, gidî!" nola şekirekî dimîne li ser zimanê wê yê şîrîn.

**Ber bi Bazîda rengîn ve**

Çaxa meriv Ermenistanê dide milê xwe yê çepê, ber û berê çemê Erezê ber bi başûr ve dimeşe, hingê çiyayê Agirî, kofiyeke ji mijê daye serê xwe û meriv pêşwazî dike. Ji dûr ve, dengê tivingeke lûledirêj olan dide. Gelo ew dengê tivinga Biroyê Heskê Têlî bû? Yaxud dengê tivinga Şêx Zahir bû? Kî çi dizane, dibe ku ew dengê tivinga Îhsan Nûrî Paşa be, û kofiyek li serê Îhsan Nûrî Paşa jî hebû! Nola kofiya ji mijê, ya li ser serê çiyayê Agirî... Hecko ev kofiya mijînî ya li ser serê çiyayê Agirî, ji Îhsan Nûrî Paşa diyarî maye. Berfa di dolên çiyayê Agirî de, nola rêşiyê kofiya generalê kurd, xwe berdaye nav çavê Agirî. Her em nêzîkî Agirî dibin, ew hîn bêtir bejna xwe bilind dike û serê wî yê bi kofî xwe dispêre kokevaniya ezmên û alema stêrkan dirijin li ser milê wî...

Te dît dinya ye! Heke rojekê riya we bi wî alî ket, qenc bala xwe bidin çiyayê Agirî. Hingê hûn ê lê vehesin ku ew ne çiya ye; ew generalê kurd ê serbikofî û pirbistêrk, Îhsan Nûrî Paşa bixwe ye. Û civata hogirên wî, ango civata stêrkan li dora wî himhimiye. Her ku bejna Agirî, bejna Generalê Agirî bilind dibe, ya min jî li hember wî û hogirên wî ew çend nizm dibe.

**Bazîd; hêlîna bazan**

Di dema serhildana Agirî de, Bazîd baregeha serhildêrên kurdan bû. Nexasim yekîneyên Şêx Zahir, li derûberê Bazîdê, mîna xezeba xwedê bûne û em li Bazîda rengîn, li meskenê Bazan e.

Meriv di derheqa herêmekê de çiqas xwedî zanîn be jî, zanîna meriv ne bi qasî zanîna xelkê wê herêmê ye. Lewra zanîna xelkê xwecihî, nola mastê kîs parzûnkirî ye. Ji ber ku em bi vê yekê serwext in, em li çiqas nas û dostan digerin, tevdek berê me didin rojnamevanê naskirî, Cewdet Baycan. Em jî pêşniyaza nas û dostan li erdê naxin û em diçin serdana Cewdet Baycan. Kê di derheqa wî ciwanmêrî de çi gotibû, kêm gotibû ne zêde... Mîna meriv biçe li ba Platon û di derheqa Sokrates de pirsan ji Platon bike. Cewdet Baycanê 70 salî jî, bi wê helwesta şagirtiyane, di derheqa seydayê xwe feylozofê kurd, Ehmedê Xanî de wanî dipeyivî û me ji ilm û zanîna Ehmedê Xanî dida serwextkirin. Heyraniya wî ya Ehmedê Xanî, di bîbikên çavên wî de diteyisî.

Çaxa em xatirê xwe ji Cewdet Baycan dixwazin, me soza ku careke din em ê bi hev re li herêmê, li ser şopên pêşiyên xwe bigerin, da hevdu. (ew ê feleka xayin, nexweşiya koronayê nehêle em soza xwe bibin serî û ew ê piştî çend rojeke din, şagirtê Ehmedê Xanî Cewdet Baycan, ji me bistîne û wî bibe cem memosteyê wî Ehmedê Xanî…)

**Qesra Îshaq Paşa**

Qesra Îshaq paşa, di sala 1674'an de, ji hêla Mîr Mihemed Pirbela ve ku tê texmînkirin li ser qesreke Xaltîyan, hatiye avakirin. Qesra Îshaq Paşa, li hemberî kela Xaltîyan a li serê kelatekê ye. Navê kela Xaltîyan Daryûnk e. Tê texmînkirin ku ev kela hanê, berî zayînê di navbera sedsala 9 û 13'an de hatiye çêkirin.

Qesra Îskaq Paşa, ji qesrên gelek serokdewletan bi şox û şengtir e. Nexş û sêwirandinên li ser dîwarê qesrê, nola dantêlên qîzên destgirtî, ew çend hûrik û nazenîn in.

Gava meriv dikeve hundirê qesrê, li ser milê çepê kaniyek duçavî heye. Ji çaviyeke wê re av, ji çaviya din re jî, di rojên cejnan û rojên pîroz de, şîr herikiye. Ew şîrê hanê jî, ji bo dilşakirina jar û belengazan bûye.

Li berder û serdera deriyê duyem jî, sêwirandina du şêran û darên jiyanê hatiye niqirandin. Territa şêran, nola giha gagerînkê bi serdera derî ve rapelikîne. Sêwirandina wan her du darên qajê jî, bi xetên bêqusûr û bi destê merîfet ên hosteyên kevirbir ve hatiye nexşandin. Tê zanîn ku deriyek ji dused kîlo zêr û kevirên giranbiha pêk dihat, li ber vî derî hebûye; di sala 1893'an de, Ûris vedigre li ser Bazîdê û wî deriyê biha lê nayê kirin, dibin. Niha ew derî di muzexaneya Lenîngradê tê pêşandin.

Gelek stran, serpêhatî û destan li ser qesra Îskaq Paşa hatine gotin. Yek ji wan destanan, a bi navê "evsaneya çiyayê Agirî" ji hêla nivîskarê gewre Yaşar Kemal ve hatiye nivîsandin.

**Feylozof Ehmedê Xanî**

Bapîrê Ehmedê Xanî Rustem, di sala 1592'yan de ji gundê Xan ê Colemêrgê bar dike tê Dîza Sor (kela Sor). Ev kela hanê, wekî borsaya Mîr Mihemed Pirbela bûye. Lewra Dîza Sor, ango kela Sor, naveda gumrukê bûye. Bavê Ehmedê Xanî, di Dîza Sor de dibe qadî, ango dadger. Ehmedê Xanî, heta çardeh saliya xwe, li ber destê bavê xwe yê dadger û birayê xwe perwerde dibe. Ehmedê biçûk, binyada ilmê xwe ji malbata xwe ya xwenda û pêşketî distîne. Paşê diçe medreseya Xelata Bedlîsê û Cizîra Botan perwerde dibe. Di van medreseyan de, li ser ilmê Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî tîr dibe û ji ber dike.

Êdî dema derbaskirina sînoran tê. Ehmedê xortik, diçe Bexda, Heleb û Şamê... Li van navendên serkana zanînê perwerdeyeke gelekî sûdemend dibîne. Li vir, li ser felsefeya yewnana antîk tîr dibe û ji felsefeya kesên nola Sokrates, Platon û Arîsto Teles têr dibe. Her wiha li van zanîngehan, bi feylozofên ereb ên nola Farabî, Sohrewerdî û Muhetîn Erebî re serwext dibe.

Ehmedê ciwan, vêca berê xwe dide Ecemistanê û dixwaze xwendina xwe li vê derê tacîdar bike. Di medreseya Tebrîz û Kirmanşanê de perwerde dibe. Li vir jî, ji ilmê Elî Herîrî, Emer Xeyam û Fîrdewsî têr dibe; ji kaniya helbestê Baba Tahirê Ûryan vedixwe. Her wiha ji nexş û nîgarên Manî re dibe bengî.

**Ehmedê Xanî vedigere Bazîdê**

Ehmedê têrperwerdekirî, nola mêşa hingiv xwe li ser her kulîlkê datîne û ji her cureyê hingiv ê zanînê berhev dike. Piştî deh salan, bê çawa Hz. Zerdeşt xwe ji şikefta xwe berdide jêr û di nav daristanê de, li kalemêrekî zanemend rast tê û kalemêrê zanemend dibersivîne, dibêje "êdî kewara min a hingiv di ser re diqulupe, loma jî diçim nav xelkê, da ku vî hingivî bi wan re parve bikim…" A ha Ehmedê Xanî jî bi vî awayî li Bazîdê vedigere, û mîrê kurdan, Mîr Mihemed Pirbela yê zîrek, li ser textê mîregiyê ye.

Mîr Mihemed Pirbela, di sala 1674'an de temelê qesra niha wekî Qesra Îshaq Paşa tê zanîn datîne. Ehmedê Xanî jî li ser temelê qesrê, ji mîrê kurdan re dibe diakar û Ehmedê Xanî yê zanamend, dibe şêwirmendê wî. Ehmedê Xanî, dixwaze bi destê Mîr Mihemed Pirbela, kurdan vegerîne ser çax û benga wan a împaratoriya berê.

Mîr Mihemed Pirbela, bi sedemek nayê zanîn di sala 1678'an de diçe ber dilovaniya xwedê.

Piştî wefata mîr, Evdî Paşayê Qop, ji hêla Osmanî ve tê wezîfedarkirin. Evdî Paşa, bapîrê Îshaq Paşa ye, lê qet ava Ehmedê Xanî û Evdî Paşa di coyekê re naherike. Loma jî Ehmedê Xanî, dev ji peywira xwe ya di rêveberiya mîregiyê de berdide; xwe vedikişîne çilxaneyê û li dû hev berhemên xwe yên niwaze, wekî Nûbihara Piçûkan, Eqîdeya Îmanê û Mem û Zîn dinivîse. Ehmedê Xanî, helbesteke gazinbarkirî wiha dinivîse: Ger dê hebûya me padîşahek/La'iq bidiya Xwedê kulahek/Te'yîn bibûya ji bo wî textek/Zahir vedibû ji bo me bextek/Hasil bibûya ji bo wî tacek/Elbette dibû me jî rewacek/Ger dê hebûya me îttîfaqek/Vêkra bikira me înqiyadek/Rom û Ereb û Ecem temamî/Hem'yan ji me re dikir xulamî/Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet/Tehsîl-i dikir me 'ilm û hîkmet/Ez mame di hikmeta Xwedê da/Kurmanc di dewleta dinê da!/A ya bi çi wechî mane mehrûm/Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm?/Kurmanc ne pir di bê kemal in/Emma yetîm û bê mecal in/Fîl cumle ne cahil û nezan in/Belkî sefîl û bêxudan in/Ger dê hebûya me jî xudanek/Alî-keremek, letîfedanek/Îlm û huner û kemal û iz'an/Şir û xezel û kîtab û dîwan/Ev cins bibûya li ba wî me'mûl/Ev neqd bibûya li ba wî meqbûl/Min dê 'elema kelamê mewzûn/Alî bikira li banê gerdûn/Bi navê ruhê Melayê Cizîrî/Pê hej bikira 'Elî Herîrî/Keyfek we bida Feqihê Teyran/Hetta bi ebed bimayî heyran…

Xanîlog û şagirtê Ehmedê Xanî, gorbihuşt Cewdet Baycan dibêje: "Piştî Arîsto û Farabî, Ehmedê Xanî, seyda û feylozofê ciwan ê sêyem e."